

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
BEŞA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

Mela Mehmûdê Tîruwayî û Ferhenga
Wî Ya Menzûm
(Metn û Lêkolîn)

Seyfettin AYKAÇ

132302107

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Alk. Doç. M. Zahir ERTEKÎN

Çewlik – 2016

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

Mela Mehmûdê Tîruwayî ve
Manzum Sözlüğü
(Metin ve İnceleme)

Seyfettin AYKAÇ

132302107

TEZ DANIŞMANI

Yrd. Doç. M. Zahir ERTEKİN

Bingöl – 2016

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî de wekî Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmze

.....

Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav

Rêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

NAVEROK

NAVEROK	II
ÖZET	V
ABSTRACT	VI
PÊŞGOTIN.....	VII
LÎSTEYA TABLO Û PÊVEKAN:	VIII
KURTEBÊJE.....	IX
1.BEŞA YEKEM.....	1
1.1.DESTPÊK	1
1.2. FERHENG Û PÊNASEYA WÊ.....	1
1.2.1. Dîroka Ferhengê	2
1.2.2. CureyênFerhengan.....	3
1.2.3. Dîroka Ferhenga Kurdî.....	4
1.2.4.Taybetiyên Ferhengên Menzûm	5
1.2.5. Di Ferhengên Menzûm de Peyvên Qur'anê	6
1.2.6. Kurtedîroka Ferhengên Menzum ên Kurdî/Kurmancî.....	7
1.2.6.1. Nûbihara Biçûkan.....	7
1.2.6.2. Gulzar	8
1.2.6.3. Luxetnameyê Ehmedî.....	8
1.2.6.4. Mîrsad'ul Etfal	8
1.2.6.5. Nûbihara Mezinan	9
1.2.6.6. Duruşteyê Mirwarî.....	9
1.2.6.7. Nûbehara Mizgefta Sîriyê.....	9
1.2.6.8. Nûbihara Qur'anê	9
1.3. Girîngiya Mijarê	9
1.4. Armanc	10
1.5. Rêbaz.....	10
1.6. Çavkanî.....	11
2. BEŞA DUWEM	11
2.1. JIYANA MELA MEHMÛD BERHEMÊN WÎ Û KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ	11
2.1.1. JIYANA WÎ	11
2.1.1.2. Malbata Wî.....	11
2.1.1.3. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Mela Mehmûd.....	11

2.1.1.4. Perwerdehiya Wî ya Fermî.....	12
2.1.1.5. Perwerdehiya Wî ya ‘İlmî	12
2.1.1.6. Melatiya Wî.....	12
2.1.2. BERHEMÊN WÎ.....	13
2.1.2.1. Sal bi Sal Heyata Pêxember	13
2.1.2.2. Tercuma Qesîdeya Mudarî	13
2.1.2.3. Ferhenga Quranê	13
2.1.3. KESEYATIYA WÎ YA EDEBÎ	13
3. BEŞA SÊYEM	14
3.1. FERHENG A MENZÛM A MELA MEHMÛD TÎRUWAYÎ	14
3.1.1. Navê Wê.....	14
3.1.2. Dîroka Nivîsîna Wê.....	14
3.1.3. Sedemê Nivîsîna Wê	14
3.1.4. Hêjmarê Malikên Wê	14
3.1.5. Taybetiyên Teşeyî	14
3.1.5.1. Şiklê Tertîbê	15
3.1.5.2. Teşeyên Nezmê	18
3.1.5.2.1. Mesnewî	18
3.1.6 Taybetiyên Ruxsarî.....	19
3.1.6.1. Wezn.....	19
3.1.6.2. Kêşeya Kîteyî	19
3.1.6.3. Serwa.....	20
3.1.6.4. Paşserwa	22
3.1.6.5. Malikên bê Serwa û Paşserwa	23
3.2. Taybetiyên Wergera Ferhengê	24
3.2.1. Wergera Bêje ji Bêjeyê.....	24
3.2.2. Wergera Hevok Ji Hevokê.....	25
3.2.3. Wergera bi Şiklê “Ravekirina Bêje yan jî Îfadeyekê” de	25
3.2.4. Pêşxistina Kurdî ser Erebî	26
3.2.5. Wergera ‘Erebî ji Kurdî.....	26
3.2.6. Wergera Erebî ji Erebî.....	27
ENCAM	29
METNÊ FERHENG A NÛBIHARA QUR’ANÊ	31
ÇAVKANÎ	143
PÊVEK:	146

KURTE

Di van salên dawî de li ser ferhengên kurdî û di nav wan de jî bi taybetî li ser ferhengên menzûm ên kurdî/kurmancî lêkolîn tên kirin. Wekî tê zanîn ferhengên menzûm bêtir ji bo zarokan û piranî ji bo fêrbûna erebî û farîsî hatine nivîsîn. Lewra bi vê teherê jiberkirina bêjeyan hêsantir dibe. Di kurdî de bi dehan ferhengên mensûr hene lêbelê ferhengên menzûm hê jî cihên xwe yên taybet diparêzin.

Di kurdî de heta niha heşt ferhengên menzûm hatine tesbîtkirin. Heft heb ji wan hatine çapkirin, yek nehatiye çapkirin. Teza me jî li ser vê ferhenga neçapbûyî ye ku nave wê *Ferhenga Quranê* ye. Yekem ferhenga menzûm a kurdî di sedsala XVIIan de ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn û navê wê *Nûbehara Biçûkan* e. Ya duwem ferhenga menzûm a Îsmailê Bazîdî ye û navê wê *Gulzar* e. Ya sêyem ferhenga Şêx Marûfê Nodeyî ye û navê wê *Lûxetnameyê Ehmedî* ye. Ya çarem ferhenga Şêx Mihemed Kerbelayî ye û navê wê *Mîrsad'ul Etfal* e. Ya pêncem ferhenga Mamoste Mela 'Ebdulkerîm Muderris e û navê wê *Duruştayê Mirwarî* ye. Ya şeşem ferhenga menzûm a Dilbikulê Cizîrî ye û navê wê *Nûbihara Mezinan* e. Ya heftem ferhenga 'Ebdusettar Rêkanî ye û navê wê *Nûbehara Mizgefta Sîriyê* ye. Heştam ferheng a Mela Mehmud Tîruwayî ye û navê wê *Ferhenga Quranê* ye.

Me di vê xebatê de ji aliyê edebî ve ev *Ferhenga Quranê* vekola. Herwiha ji ber ku heta niha nehatiye çapkirin, me transkripsiyona wê û deqa wê ya resen jî di pêvekê de bi cih kir.

Peyvên Sereke: Ferhengên Menzûm, Ferhenga Quranê, Mela Mehmûd Tirûwayî

ÖZET

Son yıllarda Kürtçe sözlükler üzerinde, daha özel anlamda ise Kürtçe (Kurmanca) manzum sözlükler üzerinde çalışmalar yapılmaktadır. Bilindiği gibi manzum sözlükler daha çok çocuklar için ve genel olarak da Farsça ve Arapça öğrenmek için yazılmışlardır. Çünkü bu yöntemle kelimelerin ezberlenmesi daha kolay olmuştur. Kürtçe’de onlarca mansur sözlük olmasına rağmen manzum sözlükler hala özel yerlerini korumaktadırlar.

Kürtçe’de şimdiye kadar sekiz manzum sözlük tespit edilmiştir. Bunlardan yedi tanesi basılmış ancak bir tanesi basılmamıştır. Tezimizin konusu basımı yapılmamış olan *Ferhenga Quranê* (Kur’an Sözlüğü)’dür. İlk manzum sözlük XVII. yy.da Ehmedê Xanî tarafından yazılmış olan *Nûbehara Biçûkan*’dır. İkincisi İsmail Bazidi’nin *Gulzar* adlı manzum sözlüğüdür. Üçüncüsü Şêx Marûfê Nodeyî’nin *Lûxetnameyî Ehmedî*’sidir. Dördüncüsü Şêx Mihemed Kerbelayî’nin *Mîrsad’ul Etfal* adlı eseridir. Beşincisi Mamoste Mela ‘Ebdulkerîm Muderris’in *Duruştayê Mirwarî* adlı eseridir. Altıncısı Dilbikulê Cizîrî’nin *Nûbihara Mezinan* sözlüğüdür. Yedincisi ‘Ebdussettar Rêkanî’nin *Nûbehara Mizgefta Sîriyê* adlı sözlüğüdür. Bunlardan sekizincisi ise Mela Mehmûd Tîruwayî’ye ait olan *Ferhenga Quranê* adlı manzum sözlüğüdür.

Bu çalışmamızda *Ferhenga Quranê* adlı eseri edebi açıdan inceledik, bunun yanında bugüne kadar basılmamış olmasından dolayı da transkripsiyonunu ve original metnini ekte verdik.

Anahtar Kelimeler: Manzum Sözlükler, Ferhenga Quranê(Kur’an Sözlüğü), Mela Mehmûd Tîruwayî

ABSTRACT

In recent years, many studies have been made on Kurdish dictionaries, especially on poetical Kurmanji dictionaries. As is known, poetical dictionaries have been written for education of children and to learn Arabic and Persian. The reason of using this method is that it is easier to memorize words. Although there are dozens of prose dictionaries in Kurdish, poetical dictionaries still remain their special place.

Until today, eight poetical dictionaries written in Kurdish have been determined. Seven of these dictionaries were published, but one of them remained unpublished. In this study I will examine *Ferhenga Quranê* which remained unpublished. The first poetical dictionary, written by Ehmedê Xanî in XVII. century, is *Nûbehara Biçûkan*. The second is İsmail Bazîdî's poetical dictionary named *Gulzar*. Third is *Lûxetnameyî Ehmedî*, written by sheikh Marûfê Nodeyî. Fourth is Sheikh Mihemed Kerbelayî's work which is called as *Mîrsad'ul Etfal*. Fifth is Mamoste Mela 'Ebdulkerîm Muderrîs's *Duruştêyê Mirwarî*. Sixth is Nûbihara Mezinan written by Dilbikulê Cizîrî. Seventh is *Nûbehara Mizgefta Sîriyê* written by Ebdusettar Rêkanî's Dictionary. The Eighth is unpublished *Ferhenga Quranê* which was written Mela Mehmûd Tîruwayî.

In this study, the work named *Ferhenga Quranê* was examined in a literary sense. On the other hand as it has been unpublished up to today, its transcription and original text is presented in the appendix.

Keywords: The Poetical Dictionary, *Ferhenga Quranê*(Qoran Dictionary), Mela Mehmûd Tîruwayî

PÊŞGOTIN

Ferhengên menzûm kerese-yên perwerdehiyê ne. Xasma ji bo zarokan rêbazeke nûwazeye û herwiha ji bo jiberkirinê jî rêbazeke kevnare û giranbiha ye. Çawa ku di ‘erebî, tirkî û farisî de, tiradîsyona ferhengên menzûm di edebiyata klasîk de ciyekî taybet heye, wisa jî di edebiyata kurdî de jî ev kevneşopî rengê xwerû û cihê dide/daye edebiyata kurdî ya klasîk.

Xebata me li ser ferhengeke menzûm ya kurdî/kurmancî ye ku heta niha nehatiye çapkirin û latînîze kirin. Berhem a Mela Mehmûd Tîruwayî ye û navê wê *Ferhenga Quranêye*.

Xebata me li ser sê beşên bingehîn û encamekî hate avakirin. Me di beşa yekem de cî da ferheng, pênaseya ferhengê, dîroka wê, ferhengên menzûm û 8 ferhengên menzûm ên kurdî. Herwiha me di vê beşê de digel giringiya mijarê; armanc, rêbaz û çavkaniyên xebata xwe jî diyar kirin.

Di beşa duwem de me jiyana Mela Mehmûd, berhemên wî, kesayetiya wî ya edebî nirxand û raxist ber çavan. Divê em bêjin cara yekem e ku ev kesayet bi berhem û jînameya xwe ve dibe mijarê lêkolînekê. Ev beş jî di bin banê sê binbeşan de hate nirxandin ku yek jiyana Mela Mehmûd, ya duwem berhemên wî û ya sêyem jî kesayetiya wî ya edebî ye.

Di binbeşa sêyem de jî em bi kûrahî li ser ferhenga Mela Mehmûd Tîruwayî *Ferhenga Quranê* sekinîn. Berhema wî ji aliyê naverok, ziman, teşe, vegotin, bêjesazî, wezn, kêş û helbestê ve hate nirxandin.

Di dawiyê de metnê latînîzekirî û metnê destxet hate dayîn. Di encamê de jî taybetiyên ku ji aliye ziman û edebiyatê ve -yên vê berhemê – derketin hemberî me hatin ravekirin.

Di amadekirina vê tezê de alîkariya gelek hevalan gihişte min. Di serî de spasîyên xwe ji seyda Mela Mehmûd Tîruwayî re pêşkêş dikim ku wî deriyê mala xwe û dilê xwe ji me re vekir û ferhenga xwe ji bo vê xabatê bê tereddut da me. Herwiha ji şewirmendê xwe Alk. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKÎN re jî sipasîyên xwe pêşkêş dikim. Û divê navê du hevalên xwe yên hêja; Zafer AÇAR û Yakup AYKAÇ jî bi bîr bînim û spasîyên xwe ji wan re pêşkêş bikim ku wan gelekî alîkarî dane min.

Seyfettin AYKAÇ- Çewlig/2015

LÎSTEYA TABLO Û PÊVEKAN:

Tablo 1: Lîsteya Beşên Ferhenga Quranê

Tablo 2: Lîsteya Sureyên ku di Ferhenga Quranê de Cî Nagirin

Pêvek: Destxeta Ferhenga Quranê

KURTEBÊJE

amd.: Amadekar

b. : beş

b.n.: binêrin

c.: Cild

h.b.: Heman Berhem

m.: Malik

M.: Mîladî

MM.: Mela Mehmûd

r.: Rûpel

1. BEŞA YEKEM

1.1. DESTPÊK

Di edebiyata Kurdî ya Klasîk de gelek çeşnên menzûm hene. Di nav wan cûreyan de ferhengên menzûm jî ciyekî taybet digirin. Weke ku têtê zanîn edebiyata klasîk li ser bingeha wezn û qafiyeyê hatiye avakirin. Ferhengên menzûmênkurdîjî li gorîvêbabetêhewl dane kuvêkevneşopiyêbişopînin. Xayeya van berheman rêbazeke perwerdehiyê ye ku ji berkirinê hêsantir dike û ji bo zarokan te'limê rewneqtir dike.

Ferhengên menzûm yekem car ji alyê gramer nûsênereb ve hatine nivîsîn û ji bo perwerdehiya zimanê erebî hatine tercîhkirin. Di vî warî de yekem berhem a Îsmâil b. Îbrahîm b. Muhammed er-Rib'î(w. 1087) ye kunavêwê *Qeydu'l – Ewabîd* e. Teshîlu'l-Fewaîd û Tekmîletu'l- Meqasidkudu ferhengên menzûmên erebî ne jilayê Cemaleddîn Ebî Ebdullah Muhammed b. Malîk b. Muhammed et-Taî (w. 1274) ve hatine nivîsîndi edebiyata erebî ya klasîk de ciyên xwe yên girîng hê jî diparêzin. Ev herdu behrem jî ji bo fêrkirina gramera erebî hatine nivîsîn. Edîp Natanazzî (w. 1106) ji bo ku erebî fêrî farisan bike bi navê *Dustûru'l-Luxa* ferhengokeke erebî-farisî amade kiriye. Ev kevneşop li Îranê û li Enedolê jî bi xurtî berdewam kiriye. Heta dewra Ehmedê Xanî berhemeke bi vîrengî ya kurdî li berdestê me tûne ye. Lomajî li gorî lêkolerên kurdî yekem ferhenga menzûm a kurdî *Nûbehara Biçûkan* a Ehmedê Xanî ye. Berhema Ehmedê Xanî duzimanî ye û kurdî-erebî ye. Piştî berhema wî berhemên bi sêzimanî jî hatine nivîsîn û bi zaravayê soranî jî bivîrengî berhem hatine çapkirin.

Ew kesên ku nû dest bi medreseyê dikan, bi rêya/saya van ferhengan peyvên zimanê 'erebî jiber dikan. Divan ferhengan de him têra xwe bêjeyên zimanê biyanî him jî qaîde û usûlên rê zimanî ciyê xwe girtine. Çand, edebiyat, pend, ilme arûzê jî di nava rûpelên van berheman de cih girtine. Divan berheman de curbicur weznên arûzê aliye helbestvaniyê yên xwendevên jî derxistiye meydanê. Bi vî rengîyên ku îstîdata wan bi helbestê hebûne, bi xwe hisiyane. Jixwe yek ji sedemên terza helbestê ya van berheman jî ev bûye. Bi gelemperî berhemên bi vî rengî bihemdele û selweleyê destpê dikan. Paşê sedemê telîfê têtê diyarkirin. Em dikarin bêjin ku *Nûbehara Biçûkan* li hemû Kurdistanê û *Luxetnameyê Ehmedî* li Başûr di hafizeya bi hezaran xwendevanan de heta roja me hatine. Ev jî nîşan dide ku berhemên bi vî rengî armancên xwe pêkanîne û têtê ji wan sûd hatiye wergirtin.

1.2. FERHENG Î PÊNASEYA WÊ

Ji bo hebûn û domkirina zimên tişta herî lazim ferheng in. Ew dewlemendiya raman û çanda gelane. Çavkaniya herî girîng e ji bo veguhestina zimên ji nesla pêşerojê re. Ferheng ji

bo hîmbûna zimên jî lazim in. Ji bo ku ferheng evqas biqiymetin li ser ferhengan gelek xebat hatine kirin. Ji wê zanista ku ser xebatên ferhangan hatiye kirin re tê gotin leksîkografi.¹ Ev peyva hanê ji yewnanî ji peyva “lexikographos” hatiye û tê wateya ‘xeberdan, peyv û gotin’ û di sala 1860an de derbasî zimanê Îngîlîzî bûye.² Em dikarin ji vî ‘ilmî re bi kurdî “ferhengzanî” bêjin. Ferhengzanî çawa ku di hemî zimanan de heye û serî xebat hatine kirin di zimanê me de jî heye û serî xebat hatiye kirin. Di nava berhemên alîkar de jî yên herî girîng ferhengên duzimanî ne. Ferhengên yek zimanî wekî yên du zimanî ne girîng in. Çavkaniyên dinê hema hema ji bo zimanê biyanî nayê xebitandin.³

Hema di berê de zimanê gelên din ji bo însanan pêwist û girîng bûn. Ev pêwistî carna ji bo ‘ilmê carna ji bo bazirganiyê û carnê ji bo siyaseta gelan bû. Ji çend sedsalan vir de ye ji bo ku dinya guherî, seyahetên ser dinyayê rihettir û zûtir bûn, zimanekî gelekî din girîngtir û elzemtir bû. Ji bo wan sedeman lawê insan hewcedarê bi ferhengên duzimanî bûn û ji ber vê hewcedariyê destpêkirin û ferhengên duzimanî çêkirin. Ev ferheng ji bo zimanê biyanî bûne çavkanî. Hatiye tesbîtîkirin ku di cerbekî de çar kesan 87 çarçûn li ferhengê lê belê hema tenê carekê li çavkaniyên dinê nihêrine.⁴ Ev cerba hanê jî gotina me dide rastandin.

Ji bo ku mijara teza me li ser ferhengekî ye divê em pêşiya her tiştî te’rîfa peyva ferhengê bikin. “Ferheng: berhema ku di zimanekî de hemî deman di çaxekî diyar de, ew peyv û biwêjên ku hatine bikaranîn gorî rêza elfabeyê bigre, binav bike, rave bike û gorî zimanekî din hevpeyvê wê nîşan bike ku jêre “luxat” jî têgotin.”⁵

1.2.1. Dîroka Ferhengê

Ji bo ku Hz. Adem hêj ku ser rûyê dinyayê re nehatibû şandinê Xwedê teala, ew hînî xebardanê kiribû û navê hemî tiştan bi wî dabû zanîn.⁶ Lê insan cara pêşîn bi kîjan zimanî xeberdaye an bi çend zimanan xeberdaye nayê zanîn. Kengê ziman zêde bûne û kengê zimanê biyanî hatiye hînkirinê nayê zanîn. Di derheqê ferhenga yekem de jî tu agahiyeke teqez nîne ka kî çêkiriye û di kîjan sedsalê de hatiye.

Di çavkaniyan de, ferhenga ku dişibihe ferhengên me yên îro ku em bêjin ferhenga yekem e kutê gotin; kargerê Mûzeyaya Îskenderiyê **Arîstophanesê** Bîzansî kêmzêde P.Z. di sedsala 2. de amade kirye. Wî peyvên ku famkirina wan zor û zehmetin berhev kirine û xistiye

¹ Gökhan Ölker, *Sözlük Türleri ve Kelime Sıklığı Sözlüğü Üzerine*, www.dilarastirmalari.com/files/Dil_Arastirmalari_9_Olker_45_60. Pdf.- 20.07. 2015.

² <https://tr.wikipedia.org/wiki/S%C3%B6zl%C3%BCk> BCk bilim

³ Zekeriyâ Bingöl, *Sözlük ve Sözlük Üzerine Bir Araştırma*, r.200, www.cu.edu.tr/DILBILIM/zekeriya_bingol_sozlukculukuzerine. Pdf.-15.07.2015

⁴ h.b., r. 200

⁵ TDK, “Türk Dil Kurumu” *Türkçe Sözlük* r. 1338. c. 2

⁶ Beqere:31

kitêb. Di wê ferhengê de salixên peyvan jî hatiye kirin. Di çaxên dinê de jî ku ev jî ji yên ewil têne hesibandin birek bi latîna û yewnanî ferheng hene. P.Z.sedsala 1. de **Pamphîlus** aniye ji 95 kitêban ferhenga yewnanî çêkirye. Yekî din jî **Marcus Verrîus Flaccuse** ku ferhenga wî ya latîna meriv dikare bi nimûnekî bêje.⁷ Piştî sedsala 9an çî rojavayê çî rojhilatê be birek ferheng û ferhengên ansîklopedîk hatine amadekirin. Di dinyayê de cara yekem ê ku peyva “ferheng”ê bikar aniye, di sala 1225an de, **John Garland** e. Di rojhilatê de ji mêj ve ser ferhengan karekî baş hatiye kirin û ev kar gelek pêşve çûne, lêbelêli rojava piştî salên dereng ev xebat destpê kirine û pêşketiye.⁸

Destpêka di pêşketina ferhengan de rojhilat ji rojava pêştir e. Di rojhilatê de ferhengên ku hatine nivîsîn yên ku herî girîng, Ebû Nasir Îsmailê Farabê (M: 1010) ku **Tacul-Luxat we Sahîhu'l 'Erebîye** ye. Yekî dinê jî ferhenga Ebû Tahir Muhammed bîn Yeqûp Fîrûzabadî (1329-1414) ye ku 60 cild e û navê wê jî **el-Qamîsû'l Muhît** e.⁹

Li rojavayê ferhenga yekem a herî girîng, bi fermana Çarîçeya Êris **Katerînaya 2.** gerokê Elman **P.S. Palas** çêkiriye. Bi rastî ji bo naskirin û danberheva zimanên dinyayê ye, lê belê zefir ew zimanên ku di nava sînorên Êris de tê bikaranîn; rêzik, qaîde û kişandina fê'lan nîşan kiriye û bi van 285 teginên ku zimanê Asya û Ewropayê de hene li hemberî wan nîşan kiriye. Bi wê xebata xwe ve di dinyayê de cara yekem ferhengeke bi pirzimanî derxistiye holê. Di sala 1787an de hatiye weşandin.¹⁰

1.2.2. Cureyên Ferhengan

Ji aliyê nivîsandinê ve ferheng bi du curan in. Yek; yên ku bi wezn û bi qayde ango helbestkî hatine nivîsandin. Du; yên ku bi şeklekî pexşankî hatibe nivîsandin in ku; ew ferhengên ku îro di dema me de tên bikaranîn in.

a. Ferhengên mensûr: Ferhengên mensur di sedsala 18. di sala 1787an de dest pê kiriye heta îro.

b. Ferhengên menzûm: Di nav Edebîyata Klasîk a Kurdî de ferhengan jî di gel celebên dinê cihê xwe girtiye. Bi rastî bingeha Edebîyata Klasîk wezn û qefiye ye. Ji bo ku bi wê şeklê bi rehetî ziman dihate hînkirin, bi xwendineke kêf û zewq peyv di wextekî dirêj de di hişê kesan de bi wî şiklê pêk dihat ji bona wê ferheng jî ji bo hînkirinê bûye perçek ji wê kevneşopê.

⁷ Bingöl, r. 200

⁸ Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumları Yayınları, 1990 Ankara, r. 72

⁹ Bingöl, r. 201

¹⁰ Aksan, h.b., r. 72.

Ji bo ku ‘Erebî zimanê Qur’anê bû, ferhengên me yên menzûm hatine nivîsîn; du heb na, lê yê din hemî Kurdî-‘Erebî hatine nivîsandin. Heta îro ev ferhengên bi şeklekî menzûm hatine nivîsîn yên ku em rast hatine digel ferhenga me 8 heb in. Em ê înzallah hemiyên hebo hebo gorî nivîsandina dîroka wan bidin naskirin. Piraniya ferhengên menzûm bi nezma mesnewî hatine nivîsandin. Bi muqeddîmeyê destpê dike, piştî ferheng, di dawiyê de jî bi xafîmeyê diqede. Di destpêka van ferhengan de pêşîya her tişî besmele piştî hemdele û selwele heye. Piştî van nivîskar; çima wê berhemê çêkiriye dibêje, navê berhemê dibêje, di derheqê fêydeyên hînbûna zimên de ramanên xwe dibêje. Di nav piraniyên ferhengên menzûm de di beşa “muqeddîmeyê” de behsa ‘ilmê luxatê dike ku ew çawa dîne mirovan fêris dike, heta zefên muellîfan dibêjin me di zaroktiya xwe de qe nebe yek ferhengeke menzûm jiberkiriye.¹¹

1.2.3. Dîroka Ferhenga Kurdî

Ji bo ku kurd bi sedşalan bê welat bûne sazîyeke wan a ku bîne berhemên wan biparêze tunebûye. Ji bo wê qasê berhemên ku kurdan nivîsîne an winda bûne an jî ew gelên bi welat, xweyî lê derketine û hem berhem hem jî nivîskarê wê ji milletê xwe hesibandine. Ji ber van pêkerên dîrokî, civakî û sîyasî di kurdî de xebatên ser zimên û ferhengan ne bi destê saziyên fermî, bi takekesî çêbûne.¹² Piştî van rasteqînan em êdî dikarin behsa dîroka ferhenga kurdî bikin.

Ferhenga kurdî ya yekemîn Nûbihara Biçûkan e ku Şêx Ehmedê Xanî di sedşala 17. de nivîsiye û piştî hatiye çapkirin. Ji bo biçûkê kurmancan hîmî zimanê ‘Erebî bin hatiye nivîsîn. Derheqê wê ferhengê de înzallah em ê di cihê wê de agahiyên zêdetir bidin.

Ji bo ku xezîneya peyvên kurdî û rêzimana wan şayeser bikin şehîşahê Romayê di sedşala 18. de rahîbê katolîk **Maurîzio Garzonî** şandiye aliyê Behdînan ve. Garzonî jî li navçe û bajarên Kurdistanê geriyaye û 20 sal li bajarê Amêdiye maye û ferhenga ku bi navê **Grammatica e Vocabolarîo Della LînguaKurda** ye amadekiriye. Ev berhem ji 288 rûpelan pêk tê. Kêmezêde tede 6700 peyvên Îtalyanî- Kurdî hene. Di sala 1787an de hatiye weşandin.

Di sala 1879an de **August Jaba** yê Polonyayî ku rojhilatnas bûye li bajarê Ūris Saînt-Petersburgê **Dictionnaire Kurde-Français** (Ferhenga Kurdî-Fransewî) diweşîne. Ev ferheng 463 rûpel e û ji 15.000 peyvên pêkhatiye. Di ferhengê de du nivîs hatiye bikaranîn. Peyvên

¹¹ Atabey Kılıç, “Klasik Türk Edebiyatında Manzum Sözlük Yazma Geleneği ve Türkçe-Arapça Sözlüklerimizden Sübha-i Sıbyan”, Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi sayı: 20 Yıl: 2006/1 r.65-77.

¹² Salih Akın, “Kürtçe Sözlük Yazarlığı”, ed. Vecdî Erbay, İnatçı Bir Bahar (Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat), Ayrıntı, 2012, İstanbul, Salih Akın, r.185.

kurdî pêşiyê bi erebî hatiye nivîsîn piştê bi herfên latînî û hatiye vegerandin bal fransewî ve.¹³

Di sala 1894an de **Yusûf Dîyauddîn Paşa**, dema ku Qeymaqamê Motkiyê bûye bi navê “**El-Hedîyyetu’l-Hamîdiyye**” Kurdî-Erebî ferhengê amade dîke. Ev ferheng di sala 1894an de li Stenbolê tê çapkirin.¹⁴ Ev ferheng zefîr bi devoka Sêrt û Bilîsê hatiye derpêşkirin. Di hin cihan de me’na peyvan gotiye û rave kiriye. Navê cihan gotiye û behsa sînorên wan kiriye. Navê jin û mêran jî gotiye. Piştê di sala 1987an de Mehmet Emîn Bozarşan qismê erebî latînîze kirye û bi navê “Ferhenga Kurdî-Tirkî” weşandiye. Ji 5452 peyvan pêk tê.¹⁵

Di sala 1950yan de li Yekîtiya Sowyetan zimanê kurdan hatiye qebûlkirin. Dibistan, rojname û weşanxanên wan hebûn. Di navendên kurdolojiyê yê wê derê de xebat û lêkolîn hatin kirin. Digel wan xebat û lêkolînan gelek ferheng jî hatin amadekirin û weşandin.¹⁶ Ev ferhengên hanê bi Kurdî û Rûsî hatine nivîsandin.

Di vê dema ku li Yekîtiya Sowyetê de ev xebat dihatin kirin li ‘Iraqê jî xebatek hinekî ya Rûsî kêmtir dihat kirin. Ji encama wê xebatê 6 heb ferheng derketiye holê. Em ê ji wan navê çend heban li vir zikîrbikin.

Raberel Murşîd; Giwî Mukrîyanî amade kiriye, 404 rupel e û 12.000 peyv e. Giwî Mukrîyanî ferhengeke dinê jî amadekiriye, bi navê; “Ferhengî Mahabad”. Şêx Muhemmed Xal jî ferhengê amade kiriye ku navê wê jî “Ferhenga Xal”û ji 40 hezar peyvan pêk tê. 1960an de li Silêmanyê hatiye weşandin. Cîgerxwîn, ferhenga Kurdî-Erebî 2 cild e, li Bexdadê hatiye weşandin.¹⁷

1.2.4. Taybetiyên Ferhengên Menzûm

Di kevneşopiya ziman de gelek agahî bi menzûmkî hatiye çêkirin ku ev agahî payidar be. Ji rêziman bigre, belaxet, tefsîr, qiraet û ‘ilmên dinê hema bêje di hemîyan de ew rêbaz bikar anîne. Ev rêbaz di dewra Hz. ‘Umer de jî bo zarok Qur’anê fêrbîn û jiberbikin di mektebên Kutab de hatiye bikaranîn.¹⁸ Ew feqiyên ku teze dest bi xwendinê kirine divê ku peyvan û rêzimanîyê bizanin. Bi wî şiklî zef rihet hîn dibûn û jiberdikirin. Bi kilamkî zef caran bi kêf û zewq dubare dikirin. Digel wê çand, edebiyat û derheqê arûzêde agahdar dibûn. Ev suxtiyên ku meyla van li aliyê helbestvanîyê ve heye ev agahiya hunerên edebî, erûz, behr

¹³ Akın, r. 185-186.

¹⁴ Saime İnal Savi, “Yusuf Ziyaeddin Paşa’nın “El-Hedîyyetü’l-Hamîdiyye”sinde Osmanlıca-Türkçe Taraması”, Ankara-1993 r. 4

¹⁵ Savi, h.b., r. 4.

¹⁶ Akın, r. 186-187

¹⁷ Akın, r. 189

¹⁸ Nurettin Ceviz, “Soner Gündüzöz, Osmanlı Medrese Kültüründe Manzum İlmi Eser Geleneğinin Güzel Bir Örneği: Lügat-i Yûsuf”, Ekev Akademi Dergisi, Yıl: 10, Sayı 29 (Güz 2006)-211

û wezn bi wan dida hînkirin.¹⁹ Ji bo hînkirinê ew peyvên ku ‘eleqa wan bi hev re heye an jî ew peyvên ku dijî hevin di yek malikê de bi hev re tê xebitandin. Digel wezn û kafiyê peyvên bi cînas jî di malik û rêzikan de tê xebitandin ku hînbûn bi zewq be. Di berhemê de dema ku hevok ji bo hînkirinê têne sazûmankirin peyvên ku meşhûr û herkes dizane tê bikiranîn.²⁰

Di zefî ferhengên menzûm de bi şiklê nezma mesnewî hatiye nivîsandin. Bi besmelê, hemdelê û selwelê destpêdikin. Piştî sebebê çêkirina wê²¹ piştî di hinekan de kurte kurt behsa Pêxember ‘eleyhîselam dikan derheqê wî de hin agahiyan didin, behsa sehabeyan, îmaman û piştî bi di’ a xilas dikan, mînak:

خدای الله قاصد رسله ای خدی زان
خلیفه چارن هم چار امان ای مسلمان

Xwedê Ellah e qasid resul e ey Xwedê zan
Xelîfe çarin hem çar îmamin ey musulman

د مکی بو ژدائی مدینه بو مدفن
وی عبدالله والد آمنه والده بزان

Di Mekkî bû ji daê Medîne bû ye medfen
Wî ‘Ebdullah e walid Amîne walîde bizan²²

Piştî van hemiyan li ser mijara xwe ya ‘esil ku ferhenge disekinin, piştî jî bi xatîmekî dawî dikan. Van hemiyan behr behr çêdikan û navê behran jî dinivîsin. Zef caran malik û risteyên wan hev nagrin.

1.2.5. Di Ferhengên Menzûm de Peyvên Qur’anê

Di çanda Îslamê de çawa ku di hemî berhemên de bandora Qurana Mecîd heye di ferhengên menzûm de jî çêbûye. Nemaze di ferhengên Kurdî-Erebî de ji bo ku Qur’an baş were famkirin peyvên ku giran û dijwar in me’nayên wan hatine gotin. Çend mînak ji Nûbihara Biçûkan;

مووده کچا هیژ خوش دانائی دنیف قبری
موقوده بدار کشتی متروک لجه مایی

Mewude keça hêj xweş danaî di niv qebrê
Mewqûze bi dar kuştî metrûkî li cih mayî

¹⁹Yusuf Öz, *Tarih Boyunca Türkçe-Farsça Sözlükler*. Ankara Üniversitesi SBE (Teza doktorayê ya li ber çapê)

²⁰Perihan Ölker, “Klasik Edebiyatımızda Manzum Lügat geleneği ve Mahmudiye”. r.4

²¹Kılıç, h.b., r.65-77

²²Ehmedê Xanî, *Nûbihara Biçûkan, Îhsan yayınları, 2004, r.18*

Neddaxetan ew her dû ê hildekelîn ji avî
Mudhammetan her dû yêñ reş bûne ji avdayî²³

1.2.6. Kurtedîroka Ferhengên Menzum ên Kurdî/Kurmancî

1.2.6.1. Nûbihara Biçûkan

Ev kitêbê hanê Şêx Ehmedê Xanî di sala 1683an de nivîsiye. Şêx bi pêşgotineke kurt, bi 13 kertan (beşan), nêzîkî 220 malik û kê m zêde bi hazar pêyvên ‘erebî ku beramberî wan ewqas peyvên kurdî hene di 33 saliya xwe de nivîsiye.²⁴ Bi besmelê bi şeklekî zanîstîkî û helbestvankî destpêdike. Piştîre bi hemd û selawat didomîne, navê kitêba xwe dibêje, ka çima û ji bo kî çêkiriye dibêje. Piştîre ji bo ku haja zarokan bi Xwedê û pêxemberê Wî û heval û hogirê Resûlullah ‘aleyhîselam çêbe libo libo û bidor behsa wan dike. Navê çar xelîfeyan û çar îmamên şerî’eta ehlê sunnetê jî dibêje. Piştîre dest bi ferhengê dike. Ji van 13 kertan a derî ya ewil yê din hemiyan de di serê beşan de pend û şîretan ji zarokên xwendevan dike. Di dawiya kitêbê de bi hevokkî me’na peyvên dibêje, dûvre rica şefa’etê ji Resûlullah ‘aleyhîselam dike û bi şeklekî mamikkî dîroka kitêba xwe nivîsiye û xelas kiriye.²⁵ Nûbihara Biçûkan hem ji bo zarok bi rehetî peyvên jiberbikin hem jî bi şeklekî kêfa mirovan tê ku bixwîne ango bi kafîye û redif nivîsiye. Mijarên xwe jî bi şeklekî amojkarî hîlbijartiye û rêzkiriye. “Ji nêzîkê bal dûr ve”, “ji tiştên ku tên zanîn û bal yêñ nayên zanîn ve” û “ji yêñ hêsayî bal ê dijwar” ev metodên hanê hemî bikar anîne.²⁶

Mijarê Nûbihara Biçûkan jî seranserî evin; ferdên malbatê û xizmên malbatê, lebatên laş, fîzyonomî, navê gîhayan, navê heywanan, navê hejmaran, behsa hewayê û navê demsalan, navê çekan, navê me’denan, navê cil û bergan, behsa çar unsuran û behsa peyvên cîma’ê.

Nûbihara Biçûkan, cara pêşî di sala 1794an de digel ferhenga kurdî-erebî ya Yusuf Ziyaeddîn Paşa ya bi navê El- Hediyyetu’l Hemîdiyye fî’l luxeti’l-Kurdiyye li Stenbolê hatiye çapkirin. 1908an de cara duyem, di sala 1985an de, Ehmed Hîlmî Qoxî di xebata xwe ya bi navê Gulzara Hemûkan de şerha wê kiriye û digel metna wê ya bi tîpên erebî li Diyarbekirê çap kiriye. Di sala 1986an de ji aliyê Zeynelabîdîn Zînar ve li Stockholmê hatiye çapkirin. Di sala 2010an de Tehsîn Îbrahîm Doskî, Nûbehara Biçûkan a Xanî û Mîrsadu’l- Etfal a

²³ Xanî, b.n., r.55

²⁴ Kadri Yıldırım, Ehmedê Xanî Külliyyatı *Nûbehara Biçûkan*, Avesta yayınları 2008, r.40

²⁵ Xanî, h.b., r.33.

²⁶ Yıldırım, r.129.

Kerbelayî, digel pêşgotineke kurt, bi hev re çap kirin. Van salên dawî Kadri Yıldırım hem di “Sempozyûma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî” de li ser vê mijarê teblîxeke berfireh pêşkeş kir, hem jî di çarçoveya xebatên “Kuliyata Ehmedê Xanî” de, di pirtûka xwe ya bi navê Nûbehara Biçûkan de bi awayekî berfireh analîz û wergera wê ya bi tirkî kiriye.²⁷

1.2.6.2. Gulzar

Gulzar, kîtaba Mela Îsmâîlê Bazîdî ye. Di sala 1655-1710an de hatiye nivîsîn. Ev kitêb jî mîna Nûbihara Biçûkan di medreseyên Kurdistanê de hatiye xwendin. Bi zimanê Kurdî-Erebî-Farisî ango bi sê zimanî hatiye nivîsîn û piranî bi zimanê Colemêrg-Bazîdê hatiye bikaranîn. Mixabîn derheqê Gulzarê de xêncî agahiyên jorê ku me nivîsiye tu agahiyeke baş me bi dest nexist. Li gorî ku em çî çavkaniyan sûdwerdigirin Gulzar bi vî rengî ye: Fehengeke kurdî-erebî-farisî ye. Di medreseyên kurdan de hatiye xwendin û di binê bandora devoka Hekkarî û Bazîdê de maye.²⁸

1.2.6.3. Luxetnameyê Ehmedî

Ev ferheng ji aliye Şêx Me’ruf Nodeyî ve hatiye nivîsîn. Ferheng kurdî-‘erebî ye. Berhem yekem car di sala 1926an de li Rewandizê hatiye çapkirin. Ev çapa yekem bi destê Seyid Huseyn Huznî hatiye kirin.²⁹ Ji bilî vê çapê gelek çapên din jî yên vê berhemê hene û hê jî bi berbelavî li başûrê Kurdîstanê tete xwendin. Nusxeya ku li ber destê me ye, di 1970an de li bajarê Sinê hatiye çapkirin û li ser rûpelê jenerîkê hatiye nivîsîn ku ev çap, çapa heftem e ku weşexaneya Întîşarata Kurdistan diweşîne. Herwiha di vê çapa ku li ber destê me de ye ji bo bêjeyan wêne jî hatine amadekirin û di pirtûkê de hatiye bicihkirin. Li ser berga berhemê hatiye nivîsîn ku wêneyên wê ji aliye ‘Ebdurrehman Mehmûd ve hatiye amade kirin. Berhem ji destpêkek û du beşan pêk tê. Di berhemê de 370 malik hene û nêzî 1350 bêjeyên erebî û kurdiya wan hene.

1.2.6.4. Mîrsad’ul Etfal

Ev ferheng ji aliye Şêx Mihemmed Kerbelayî hatiye nivîsîn. Kurdî-farisî ye. Berhem ji destpêkek û 14 beşan pêk tê. Di berhemê de 320 malik hene û nêzî 1155 bêjeyên farisî û kurdiya wan hene.

²⁷ Ramazan Pertev, *Mîrsadul Etfal (Şahrahê Kudêkan)* Ferhenga Menzum a Kurdî-Farisî, weşanên Nûbihar, Stenbol, 2012.

²⁸ Pertev, h.b., r.26.

²⁹ Pertev, h.b., r.26.

1.2.6.5. Nûbihara Mezinan

Ferng ji aliye Dilbikulê Cizîrî (Abdulkadir Bingol) ve hatiye nivîsandin. Di sala 2015an ji aliyê weşanxaneyê Nûbiharê ve hatiye weşandin. Kurdî-tirkî ye. Him ji aliyê malikan ve him jî ji aliyê hêjmara peyvan ve ferhenga menzûm a herî mezin e. Di vê berhemê de 13.104 kelîmeyên kurdî, 8268 kelîmeyên tirkî û 3337 malik hene. Ferheng li gorî wezna arûzî hatiye amadekirin. Pênc qalibên erûzê têde hene. Nivîskar di pêşgotina berhema xwe de sedema nivîsandina berhemê wiha rave dike: “Her tişt bi amadekirina helbesta min ya bi navê “De were Ehmedê Xanî Melayî tu bi xwe’r bîne” dest pê kir kudi vê helbesta xwe de, min kurdîaxaftina ji Kurdiyê dûr a nivî tirkî nivî kurdî rexne dikir. Beriya hingê niyeteke min ya bi vî rengî tunebû. Piştî ku min ew helbest amade kir û di internetê de weşand, gelek hevalên min ên kurdî-hez kêfa xwe jê re anîn. Peyam li ser peyamê ji min re şandin û ez teqdîr kirim. Di nav wan maîlên ku ji bo min hatibûn avêtin de, dihate xwestin ku ez vê helbestê hîn berfireh bikim û wekî pirtûk çap bikim.”³⁰»

1.2.6.6. Duruşteyê Mirwarî

Li ser berga wê navê wê weke “Duruşte, ferhengê ‘erebî-kurdî be helbest” nivîsandiye. Navê amadekarê wê jî weke “Mamoste Mela ‘Ebdulkerîm Muderris” hatiye nivîsandin. Di ferhengê dê nêzî 2620 peyv hene. Yekem car di sala 1970ê li bajarê Sinê ji layê çapxaneyê Întîşarata Kurdistan hatiye weşandin. Ferheng 94 rûpel e.

1.2.6.7. Nûbehara Mizgefta Sîriyê

Ev ferheng ji aliye ‘Ebdusettar Rêkanî hatiye nivîsîn. Berhem di weşanxaneyê Pirtûkxaneyê Diyarbekir a Zaxoyê di sala 2014an de hatiye weşandin. 54 rûpel e û ‘erebî-kurdî ye. Ferheng ji 1330 kelîmeyan pêk tê.

1.2.6.8. Nûbihara Qur’anê

Berhem ji aliye Mela Mehmud Tîruwayîvehatiye nivîsandin ku teza me li ser vê ferhengê ye. Ji ber ku di beşên vê de em ê bi berfirehî li ser wê rawestin li vê derê em ê li ser neseकिन.

1.3. Girîngiya Mijarê

Mijara teza me destxeteke neçapbûyî û nelatînîze ya ferhengeke menzûm e. Jiberkuhetaniha li ser vêferhengokê tu xebatnehatine kirin û negihaştîyêberdestêxwendevanênkurdî, girîng e. Herwiha ev behrem jiberkuferhengaQuranapîroz e û gelekbejeyênzorwateyênQuranêşîrove dike û dike kurmancî

³⁰ Dilbikulê Cizîrî, *Nûbehara Mezinan*, Weş. Nûbihar, Setenbol 2015, r.2.

bala me kişand. Wisatexmîn dikim kudê bala lêkoliner û xwendevanênkurdîjîbikêşe. Bivêberhemêjimarafêhengênmenzûmênkurdî -li gorîtespîtenme- bûn heşt.

1.4. Armanç

Armanca me ya serekerizgarkirinaberhemekekurdî ya klasîkjiwendabûnê ye. Helbetmerivdivîwarî de dikaregelektiştanbêje, lêdiserî de berhemekekurdî li pirtûkxaneyakurdîzêdebû. Duwemjî behrem jihalêdestxetê û jiwindabûnêxilasbû. Sêyembiawayekî edebî bûmijaratezekê.

1.5. Rêbaz

Rêbazateza me li gorîpîvanên lêkolîna edebiyata klasîkhatemeşandin. Pêşjiyanahelbestvan û berhemenwî û kesayetiyawî ya edebî hatepêşkêşkirin. Paşê berhem jialiyêruksar û naverokê ve bi hûrgilîhate vekolîn. Piştîncamêjîmetnê tenkîdî kete navatezê û herwihametnêdestxetjîdîpêvekê de cîyêxwegirt. Ditranskirîpsiyonê de me elfabeyatranskirîpsiyonêbi kar anî ku ev jî ev e:

AlfabeyaTranskirîpsiyonê

ث	â	
ح	ħ	Ĥ
ذ	ẓ	Ẓ
ص	ş	Ş
ض	d, ẓ	Ẓ
ط	ṭ	Ṭ
ظ	ẓ	Ẓ
ع	è	‘
غ	g	Ĝ
ء	é	’
Apastrops	`	

1.6. Çavkanî

Çavkaniyênserekedestxetaberhemê û nivîskarêwêbixwebûn. Me li mala nivîskarrûbirûdiderbarêjiyan û berhemênwî, sedemêtelîfê û gelekagahiyên din jiwîwergirtin. Piştîhingêmetnêdestxetbûserekeçavkanî, li berdestê me.

2. BEŞA DUWEM

2.1. JIYANA MELA MEHMÛD BERHEMÊN WÎ Û KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ

2.1.1. JIYANA WÎ

2.1.1.1. Nav û Mexlesa Wî

Navê nivîskarê Ferhenga Quranê di fermiyetê de Mehmûd Gündüz e. Ji ber karê xwe yê melatîyê, bi navê Mela Mehmûd tê nasîn. Mexleseke wî ya ku bi kar aniye tune ye.

2.1.1.2. Malbata Wî

Mela Mehmûd kurê Mela Yusûf e. Mela Yusûf û malbata wî eslê xwe ji gundê Tîruwa³¹ ya Kerboranê³² ne. Tîruwa jî yek ji wan gundan e ku ji gundê Bêcirmanê veqetiyaye û bûye gund. Ango şêniyên Tîruwa û Bêcirmanê xizm û pismamê hev in. Ji ber hindê şêniyên gundê Tîruwayê hemû seyîd in. Lewra Mela Yusûf bi navê Seyîd Mela Yusûf dihate nasîn.

Çar kurê Mela Yusûf hene. Bi rêzê navê wan; Hecî Evdirehman, Seyîd Ehmed, Mela Mihemed û Mela Mehmûd in. Di nav wan de Mela Mihemed û Mela Mehmûd hem cêwî bûn hem jî biçûkên malê bûn. Birayên Mela Mehmûd jî mîna wî di gundê Tîruwayê de hatibûne dinê û li ber destê bavê xwe perwerdehiya xwe dîtibûn.

Wek tê dîtin malbata Mela Mehmûd malbateke dîndar e û Mela Mehmûd jî di wê hawirdorê de mezin dibe. Diyar e ku ew hawirdor li ser wî bandoreke mezin dike û jiyana wî jî ber bi vî alî ve diçe û dûre dibe mela.

2.1.1.3. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Mela Mehmûd

Mela Mehmûd di sala 1965an de li gundê Tîruwayê tê dinê. Mela Mehmûd li wî gundî mezin dibe. Gava Mela Mehmûd dibe şeş salî, bavê wî ji gundê xwe derdikeve û diçe gundê Îdilê³³ û li wir melatî dike. Ji vir pê de Mela Mehmûd êdî li wî gundî dimîne û mezin dibe.

³¹Tîruwa: Bi tirkî navê wî Bağözü ye.

³²Kerboran: Navçeya Mêrdînê ye. Dikeve aliyê Şîrnexê. Bi tirkî Dargeçit.

³³Îdil: Gundekî girêdayî Şîrnexê ye.

2.1.1.4. Perwerdehiya Wî ya Fermî

Mela Mehmûd hem ji ber karê bavê xwe û hem ji ber rewşa welêt di gelek dibistanan de dixwîne. Ew dibistana seretayî li Îdilê dixwîne, ji alîkî ve diçe dibistanê ji alîkî ve jî li cem bavê xwe dersên ilmî digire. Hê di biçûktiya xwe de li cem bavê xwe Quranê xitim dike, piştî Mewlûda Bateyî, Nûbihara Biçûkan û Nehcûl En'amê hem bi derskî me'na wan hîm dibe hem jî hemîyan jiber dike.

Piştî ku dibistana seretayî bi radeyeke bilind diqedîne di sala 1975an de bavê wî ji bo dibistana navîn kurê xwe dişîne Îmam Xetîbê ya Batmanê. Mela Mehmûd piştî ku azmûnên Îmam Xetîbê bi awayekî serkeftî derbas dibe, dest bi vê dibistanê dike û dûre jî di heman dibistanê de derbasî lîsê dibe. Bi tevahî sê sal dibistana navîn û çar sal jî lîsê dixwîne û di sala 1982an de lîseyê diqedîne.

2.1.1.5. Perwerdehiya Wî ya 'İlmî

Mela Mehmûd gava li Batmanê dest bi dibistanê dike, di gelek cihan de dimîne û li wan deran xwendinên xwe yê ilmî pêş dixê. Ew di sala 1975an de li Batmanê cara yekem di medreseya Şêx Qutbedîn de salekî dimîne. Di sala 1977an de derbasî Mizgefta Ebûbekir dibe. Li wir ji Seydayê Mela Hesên dersên 'ilmî digire. Di sala 1978an de li Mizgefta Iluhê dimîne. Li wir jî ji Mela Tahir dersan digire. Di sala 1979an de derbasî Mizgefta Şêx Fexreddîn³⁴ dibe. Li wir jî li cem Seydayê Mela Mihemed Dêrîzbîndersên xwe dixwîne. Mela Mehmûd gava li wir dimîne lîseyê xwe diqedîne û ji Batmanê cuda dibe.

Mela Mehmûd piştî xilaskirina dibistana navîn û lîsê, diçe Mîdyadê. Li wir di medreseya Şêx Seydayê Mela Beşîr de nêzîkî du salan dixwîne û xwendina xwe li wir diqedîne û îcazeyê xwe ji Şêx Seydayê Mela Beşîr distîne. Piştî ku xwendina xwe ya 'ilmî jî xilas dike, dest bi melatîyê dike.

Ew di perwerdehiya xwe de zêdetir li ser zimanê kurdî û erebî de disekine. Nemaze erebiya xwe qasî kurdiya xwe pêş dixê. Dûre em dibînin ku saya vê pêşxistinê dê berhemeke hêja binivîsîne.

2.1.1.6. Melatîya Wî

Mela Mehmûd piştî xilaskirina xwendina xwe li Gercosê gundê Hêmêdiyê dest bi melatîyê dike û 4 salan li wir dimîne.

Di sala 1990an de tê gundê Çiplêxê³⁵ û li wir jî 25 salan melatî dike. Di sala 2015an de jî derbasî gundê Kanîspî³⁶ dibe û hê jî li wir melatîyê dike.

³⁴ A niha navê wê mizgeftê "Hacı Şirin Camii" ye.

³⁵ Çiplêx: Girêdayî Qosera Mêrdînê ye. Bi tirkî navê wê Çıplak e.

2.1.2. BERHEMÊN WÎ

2.1.2.1. Sal bi Sal Heyata Pêxember

Ev berhem helbest e, ji 63 malikan pêk tê, zimanê vê kurdî (kurmancî) ye û bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Helbesteke bi wezn/kêş e. Mela Mehmûd di vê helbesta xwe de sal bi sal jiyana Hz. Muhammed ‘eleyhîselam nivîsiye. Ji ber vê yekê helbest ji 63 malikan pêk tê ku di heman demê de îşaretê temenê Hz. Pêxember ‘eleyhîselam dike.

2.1.2.2. Tercuma Qesîdeya Mudarî

Ev berhem helbest e û bi weznê hatiye nivîsandin. Nêzîkî du rûpelan e, bi tîpên erebî hatiye nivîsandin û zimanê wê jî kurdî(kurmancî) ye. Mela Mehmûd di vê helbesta xwe de Qesîdeya Mudarî bi awayekî helbestkî şîrove kirye û wergerandiye.

2.1.2.3. Ferhenga Quranê

Ev pirtûk berhemeke ferhengî ye. Ji ber ku mijara teza me ev berhem e, me di teza xwe de bi kitekit behsa vê ferhengê kir.

2.1.3. KESEYATIYA WÎ YA EDEBÎ

Mela Mehmûd li medreseyên Kurdistana Bakur xwendina xwe kuta kiriye. Di vê serdema nû de yek ji helbestvanên şopînerê edebiyata klasîk e. Weke tê zanîn tiradisyona edebiyata kurdî ya klasîk gelekî lawaz maye. Êdî kêma kes dîwanan dinivîsîn û arûzê di helbestên xwe de bi kar tînin. Ji ber vê yekê Mela Mahmûd bi ferhenga xwe ya Quranê û berhemên xwe yên din girîngiyekê dide edebiyata kurdî ya klasîk a vê sedsalê.

Tevî ku li Bakur tirkî nivîsîn rewac e, gelek seydayên me jî ‘ilmên xwe bi ‘erebî diweşînin û edebiyata modern a kurdî di rewacê de be jî, Mela Mahmûd berovajî şopa klasîkî domandiye û ji pêşengên edebiyata kurdî sûd wergirtiye. Bi vî awayî navê xwe li rex navên 7 nivîskarên ferhengên menzûm ên kurdî nivîsandiye. Xuya ye ku seyda bêtir di bin bandora Melayê Cizirî û Ehmedê Xanî de maye. Bandora ‘erebî gelege li ser zimanê wî. Kurdiya wî kurdiya herêma Mêrdînê ye û rewan e. Seyda li jiyana ye û kar û barê ‘ilmî û nivîskariya wî berdewam e.

³⁶**Kanîspî:** Girêdayî Qosera Mêrdînê ye. Bi tirkî navê wê Günlüce ye.

3. BEŞA SÊYEM

3.1. FERHENG A MENZÛM A MELA MEHMÛD TÎRUWAYÎ

3.1.1. Navê Wê

Navê berhemê Ferhenga Quranê ye.

3.1.2. Dîroka Nivîsîna Wê

Mela Mehmûd berhema xwe di salên 2000an de nivîsiye.

3.1.3. Sedemê Nivîsîna Wê

Mela Mehmûd piştî ku nivîsîna ferhenga xwe xilas dike, kitêba Elfiyetu Ebû Zur'e dibîne ku ev ferheng jî ferhenga Quranê ye lê zimanê wê bi erebî ye. Mela Mehmûd beriya ku ferhenga xwe binivîsîne, ferhengeke wiha li derdora wî tunebû. Lewra dixwast ku ferhengeke bi vî awayî bikêr hebe û peyvên dijwar ên Quranê rave bike. Lê nêzî vê ferhengê kitêba Tefsîrê Celaleyn hebû. Di wê kitêbê de hin peyv wekî haşiye/jêrenot hatibûn ravekirin. Lê di nivîsandina vê ferhengê de ji bo Mela Mehmûd mînakê herî girîng Nûbihara Biçûkan bû. Ji ber ku Nûbihara Biçûkan jî ferhengeke kurdî-erebî bû, bi weznê hatibû nivîsandin û berhemeke menzûm bû. Ji ber vê yekê jê sûd wergirtin hêsan bû. Mela Mehmûd jî beriya ku vê ferhengê binivîse, peyvên dijwar ên Quranê libo libo derxistine. Xwendin û jiberkirina wan peyvên ji bo ku hêsantir be, dûre biryar digire ku bi awayekî manzûm binivîsîne. Ji gotinên Seyda jî tete fêmkirin, sedema sereke ya nivîsandina vê berhemê xwestina bi hêsanî têgihîştina Qurana Pîroz e.

3.1.4. Hêjmara Malikên Wê

Ferhenga Quranê bi tevahî 90 beş û ji 1556 malikan pêk tê. Di vê ferhengê de her beş aîdî sûreyekî ye. Ji ber vê rêza sûreyan, li gorî Quranê hatine diyarkirin lê jimareya wan a Quranê û vê berhemê heta dawiyê hev nagirin lewra di vê xebata me de 89 sureyên Quranê hatine nirxandin.

3.1.5. Taybetiyên Teşeyî

Me di beşa duyemîn de Ferhenga Quranê ji aliyê teşe û ruxsarî ve vekola. Li vir di binbeşa yekem de jimareya beşan, navê sûretan û hejmara wan bi tabloyekê hatin lîstekirin. Herwiha li ser teşeyên nezmê hat sekinandin. Di binbeşa duyem de ferheng ji aliyê ruxsarî ve hat nirxandin. Li virbehsa wezn û kêşeya kîteyî hat kirin. Herwiha nimûneyên serwa, paşserwa, cînas û hwd. hatin tespît kirin.

3.1.5.1. Şiklê Tertîbê

Wek tê zanîn ku di Quranê de 114 sûret hene. Wek mînak Sûretê Nîsa hem di Quranê de hem jî di vê ferhengê de beşa 4. e; lê gava ku em hineke din jî pêş de diçin, mesela Sûretê Nas di Quranê de sureta 114. lê di ferhengê de beşa 89. e.

Li jêrê me tabloya beşên ferhengê nîşan dane:

Jimara Beşê	Navê Suretan	Hejmara Malikan
1.	Suretê Fatihê	8
2.	Suretê Beqerê	234
3.	Suretê Alî'imran	186
4.	Suretê Nîsa	131
5.	Suretê Maîde	53
6.	Suretê En'am	68
7.	Suretê E'raf	106
8.	Suretê Tewbê	53
9.	Suretê Yûnus	12
10.	Suretê Hûd	38
11.	Suretê Yûsuf	32
12.	Suretê Re'd	15
13.	Suretê Îbrahîm	17
14.	Suretê Hicr	18
15.	Suretê Nehl	49
16.	Suretê Kehf	24
17.	Suretê Meryem	24
18.	Suretê Ta-ha	25
19.	Suretê Enbiya	23
20.	Suretê Hec	24
21.	Suretê Mu'mînûn	16
22.	Suretê Nûr	11
23.	Suretê Furqan	33
24.	Suretê Neml	10
25.	Suretê Qeses	10
26.	Suretê Rûm	2
27.	Suretê Loqman	2
28.	Suretê Ehزاب	10

29.	Suretê Fatir	4
30.	Suretê Yasîn	10
31.	Suretê Sad	3
32.	Suretê Zumer	4
33.	Suretê Xafir	6
34.	Suretê Duxan	4
35.	Suretê Ehqaf	4
36.	Suretê Qîtal (Muhemmed)	5
37.	Suretê Înna Fetehna	5
38.	Suretê Hucûrat	3
39.	Suretê Qaf	4
40.	Suretê Zariyat	5
41.	Suretê Tûr	5
42.	Suretê Necm	9
43.	Suretê Qemer	7
44.	Suretê Rehman	7
45.	Suretê Waqî'e	13
46.	Suretê Hedîd	3
47.	Suretê Mucadele	4
48.	Suretê Heşr	9
49.	Suretê Cumû'e	4
50.	Suretê Mulk	6
51.	Suretê Nûh	10
52.	Suretê el-Haqqeç	8
53.	Suretê Me'aric	8
54.	Suretê Cin	6
55.	Suretê Muzemmîl	7
56.	Suretê Mudessîr	5
57.	Suretê Qiyamet	4
58.	Suretê İnsan	5
59.	Suretê Murselat	8
60.	Suretê Nebe'	8
61.	Suretê Nazî'at	13
62.	Suretê 'Ebese	4

63.	Suretê Tekwîr	7
64.	Suretê Înfîtar	2
65.	Suretê Muteffîfîn	3
66.	Suretê Înşîqaq	5
67.	Suretê Burûc	5
68.	Suretê Tariq	4
69.	Suretê E'la	1
70.	Suretê Ğaşîye	7
71.	Suretê Welfecr	7
72.	Suretê Beled	7
73.	Suretê We`ş-şems	4
74.	Suretê We`l-leyl	3
75.	Suretê We`d-duha	2
76.	Suretê We`t-tîn	4
77.	Suretê Îqre'	3
78.	Suretê Beyyîne	4
79.	Suretê Zîlzal	2
80.	Suretê 'Adîyat	5
81.	Suretê Qari'e	4
82.	Suretê Humeze	5
83.	Suretê Fîl	5
84.	Suretê Ma'ûn	4
85.	Suretê Kewser	1
86.	Suretê Tebbet	3
87.	Suretê Îxlas	3
88.	Suretê Feleq	3
89.	Suretê Nas	4
90.	Beşa Dawiyê	5

Wekî li jor jî dixuyê beşa herî dirêj Sûretê Beqere (b. 2.) ye ku ji 234 malikan pêk hatiye. Li dû wê jî Suretê Alî'imran (b. 3.) e ku bi 186 malikan; û yan din jî Sûretê Nîsa (b. 4.) ye ku bi 131 malikan ve ketine rêzê. Herwiha dîsa em di listeyê de jî dibînin ku beşa herî kurt Sûretê E'la (b. 69.) û Suretê Kewser (b. 85.) in ku ji 1 malikê pêk hatine.

Li vir em dibînin ku nivîskarê vê ferhengê Mela Mehmûd, di berhema xwe de 25 suretên Quranê qet hilnedaye û behsa wan nekiriye. Ew suretên ku di vê ferhengê de cî negirtine ev in:

Sûretê ku di Ferhengê de cî Nagire	Rêza Suretê di Quranê de	Sûretê ku di Ferhengê de cî Nagire	Rêza Suretê di Quranê de
Enfal	8	Munafîqûn	63
Isra	17	Texabun	64
Şû‘era	26	Telaq	65
‘Enkebût	29	Tehrîm	66
Secde	32	Qelem	68
Sebe‘	34	Inşîrah	94
Saffat	37	Qedr	97
Fussîlet	41	Tekasur	102
Şûra	42	‘Esr	103
Zuxruf	43	Qureyş	106
Casiye	45	Kafirûn	109
Mumtehîne	60	Nesr	110
Saff	61		

Tablo 2: Lîsteya Sûretên ku di Ferhenga Quranê de cî nagirin

3.1.5.2. Teşeyên Nezmê

Ferhenga Quranê bitevahî ji 90 beşan pêk tê. Di nav van 90 beşan de 89 beşên ewil ji bo ferhengê, beşa dawiyê jî ji bo hemdele û selweleyê hatiye veqetandin. Gava em li ser vê berhemê hûr dibin di teşeya nezmê de mesnewî bala me dikişîne.

3.1.5.2.1. Mesnewî

Wek têgeheke ferhengî bi wateya “du du; cot; du libî; duwanî” ye. Mesnewî ew teşeya nezmê ye ku her malik di nav xwe de hemserwa ye û bi behrên kurt ve tîn nivîsîn.³⁷ Risteyên her malikê bi vî awayî ne: aa – bb – cc ...³⁸ Ferhenga Quranê jî ji serî heta binî bi şiklê mesnewî ve hatiye nivîsîn. Wek mînak;

2/1 Ew hûrûfî serî surete quran a

³⁷Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, weş. TDK, İstanbul, 2013, r. 167.

³⁸ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Kapı, İstanbul, 2012, r. 309.

	Muqetçe‘e; kes nizanî me‘na wan	a
2/2	Ġeyrê Xwedê ku xaşî ‘ilmê Wî ne	b
	Elîf lam û qaf û nûn û ta sîn e	b
2/3	Bêşek û bêşubhe ye la reybe fîh	c
	Yuqînun e; yu‘mînun amene bîh	c
2/4	Çi bitirsîne çi jê netirsîne	d
	Eenzê emlem tunzêr nânîne	d

3.1.6 Taybetiyên Ruxsarî

3.1.6.1. Wezn

Gava ku em li Ferhenga Quranê lêdikolin, ji serî heta binî bi 11 kîteyan ve hatiye nivîsîn û ji aliyê dengsaziyê ve jî xwedan aheng e. Lê mixabin Mela Mehmûd di temamê berhemê de ev yek neparastîye.³⁹ Ji ber vê yekê me vê berhemê ji aliyê weznê zêdetir, ji aliyê *keşeya kîteyî* ve nirxand.

3.1.6.2. Kêşeya Kîteyî

Kêşeya kîteyî, wekheviya hejmara kîteyên risteyan e ku di heman demê de di navbera wan de ahengek heye.⁴⁰ Li gor vê rêzîkê du taybetiyên girîng hene. Yek ji wan wekheviya kîteyên risteyan e; ya duwem jî di risteyan de dema ku tê xwendin, sekinîna hin ciyan e. Ferhenga Quranê ji serî heta binî bi 11 kîteyan ve hatiye nivîsîn. Risteyên yanzde kîteyî ku jê re risteyên yanzdehî jî tê gotin, piranî bi rawestên (4+4+3) têne xwendinê.⁴¹ Wek mînak;

4/131 Ji bona em nekevin delaletê
Xwedê naxwaze ji me xetîetê

5/12 Ma heywana zûbîhe ‘elen-nuşub
Bibî qurban ji bo şenem û nuşub

³⁹ Dema ku me pîrsa di nivîsîna ferhengê de nebûna li ser weznê lê pîrsî, Mela Mehmûd vê yekê qebûl kir û wiha got: “Rast e, di hin ciyan de li gor weznê ye lê tê de gelek xirabî hene, lewra min jî li gor heceyan (kîte) ferhenga xwe nivîsî.” Seyfettin Aykaç, “Hevpeyvîn: Mela Mehmûd”, 20.05.2015, Gundê Kanîspî/Qoser.

⁴⁰Dilçin, h.b., r. 40.

⁴¹Dilçin, h.b., r. 41.

3.1.6.3. Serwa

Serwa, bi kemañî wekheviya dengên dawîya du risteyan e. Nivîsandina wan mîna hev in lê wateya wan cuda ne. Serwa di helbestê de ahengê saz dike.⁴² Wek mînak;

2/1 Ew hûrûfî serî surete **Quran**
Muqetî'e; kes nizanî me'na **wan**

15/12 Kullun 'ela mewlahû bargiranî
Kelemhîl beşerî çavî xwe **danî**

4/23 'Elen-nîsaî li ser pîreka xwe
Amîr û mudebbîrin lî mala xwe

Em ê serwayên ferhengê li gorî deng û ciyê wan binirxînin.

Li gor Dengê Serwayê

Me serwayên ferhengê li gor dangan di bin sê beşan de senifandin.

Serwaya Lawaz

Wekheviya dengê bi tenê ye di serwayê de.⁴³ Wek mînak;

4/41 Lemma bî el sînetî bi zimanê xwe
Meyl û xwehrî dixine kelîmeyê xwe

5/2 Behîmetun ji weşiyê en'ama
Behîmetun ji cenînê en'ama

6/6 Fequtî'e dabîrûl qewmîl lezîn
Qewmê zalim xîlas ka wa hatin

Serwaya Asayî

Wekheviya du dangan e di serwayê de.⁴⁴ Wek mînak;

⁴²M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, weş. Gökkuşbe, İstanbul 2014, r. 257.

⁴³Dilçin, h.b., r. 86.

- 6/5 Feîzaahûm mublîsûne ayîs**ûn**
 Ji her xêrê ew meórûmin xasîr**ûn**
- 6/61 Nasîk ‘abîd nusuk ‘ibadetê xas
 Ji bo Ellah bê kirin ew bi ixlas
- 7/3 Me‘ayîşe esbabî me‘îşetê
 Ji xwarin û vexwarin û kîswetê
- 15/4 Leómen goştê terîyyen ter û nazik
 Hîlyeten ey zîneten ji bo jinik

Serwaya Zêdebar

Wekheviya ji du dangan zêdetir e.⁴⁵ Wek mînak;

- 6/12 Emr û hukmê li erd û asîman
 Nazilbûna rehm û ‘ezab ji esman
- 7/5 Bîma exweytenî ey bi sebebî
 Ew kema edleltenî bî sesebî
- 8/10 Tîcaret`un texşewne kesadeha
 Menfe‘et û kar û rewac rîbheha
- 9/4 Lîllezîne ehsenû ey amenû
 Elhusna cennete eyîl ehsenû

Serwaya bi Cînas

Serwaya bi cînas ew peyv in ku deng, nivîs û bilêvkirina wan mîna hev in lêbelê wateya wan ji hev cuda ne.⁴⁶ Cînas yek ji hunerên edebî ye. Di mînaka jêrê de *heva* yekem

⁴⁴Dilçin, h.b., r. 87.

⁴⁵Dilçin, h.b., r. 89.

⁴⁶Dilçin, h.b., r. 90.

lêkera alîkar a bidinhev e ku bi wateya *bicivînin*, *bînin ser hev*; heva duyem jî bi wateya *yek bi yek e*, *dû hev re ye*.

19/22 Yewme netwî ey necme’u bidin **hev**
Asîman bitewînin li ser **hev**

18/6 We fetennake futunen bi **bela’**
Îbteleynake belaeen fe **bela’**

17/24 Lehum rîkzen ye’nî şewten**exfiyyen**
Çûn hilakî nema şewt**exfiyyen**

19/7 Kaneta retqen ey şeyen **waḥîden**
Feteqna ferreqna waḥîd**waḥîden**

3.1.6.4. Paşserwa

Ew deng an jî bêje ne ku di dawiya risteyê de cî digirin, hem ji aliyê nivîsîn hem jî ji aliyê wateyê ve mîna hev in.⁴⁷ Di mînaka jêrê de “e” paşserwa ne.

17/5 Heyyîn û ey yesîrun ew reḥet e
Weḥenanen mîn ledunna reḥmet e

Li jêrê hemû paşserwayên ferhengê bi mînakan ve hatine diyarkirin.

Paşserwayên ku di Halê Qertafan de ne

Ew paşserwa ne ku di halê qertafan de ne. Wek mînak;

4/33 Muxtalen tekebbûra ser însana
Fexuren bitîrîtiya bi nî‘metana

8/12 Necesun muşrîk necisî ḥukmîne
Îbn û ‘ebas got necisê ‘eynî ne

⁴⁷Pala, h.b., r. 29.

13/4 Yetecerre'u dixwazî biqurpînî
La yekad yusîxu nika biqursînî

Paşserwayên ku di Halê Bêje yan jî Kombêjeyan de ne

Ew paşserwa ne ku di halê bêje yan jî kombêjeyan de ne. Wek mînak;

8/15 Yuḥya bê sincirandin ew zêr û zîv
Fetukwa bê daxkirin bi zêr û zîv

7/103 Mîn rîbatîl xeylî hespa hazir kin
Tewîlxa nada bila wa hazir kin

15/7 Etellahû nubyanehum rakîra
Qeşrî wa ji esasî bin rakira

15/6 Rewasî ye en temîde temîle
Ey lî en la temîde la temîle

3.1.6.5. Malikên bê Serwa û Paşserwa

Di ferhengê de hinek malik hene ku bi kêşeya kîteyî hatine nivîsîn lê serwa yan jî paşserwa di wan de tune. Me mînakên bi vî awayî di bin vê beşê de civandin. Wek mînak herdu mînakên ewil bê serwa ne, mînaka sêyemîn jî bi paşserwa ye lê bêserwa ye.

12/4 Ma texyîdul erḥamu nuqsan dikî
Sewarîbun bîneharî zahîr dîkin

15/2 Hîne wextê turîhûne êvarê tê
Setreḥûne wextê şibha derkevî

17/12 Wehcurnî ey wetruknî terka min bike
Melîyyen dehren tewîlen pê bike

Me di beşa duyem de Ferhenga Quranê bi mînanan ve hem ji aliyê teşe hem jî ji aliyê ruxsarî ve vekola. Di encama vê vekolînê de mirov dikare bêje, Ferhenga Quranê yek ji wan berheman e ku keşêya kîteyî bi awayekî serkeftî hatiye tetbîqkirin û herçiqas ji aliyê kêşeyê ve serkeftî nebe jî ji aliyê ahenga dengî ve gelek bihêz e.

3.2. Taybetiyên Wergera Ferhengê

Nûbihara Quranê ji aliyê teşeya wergerê ve xwediyê gelek cudahiyan e. Hem terzeke wê ya standard tune ye hem jî xwedî kêşe ye. Yanî nivîskarê vê menzûmeyê di hemî sûretan de eynî rêbaz bi kar neaniye. Di hin sûretan de bêjeyên kurdî wekî werger an jî wateya bêjeyên erebî bi kar anîne, di hinekan de bêjeyên erebî bi hev re bikar anîne û di hinekan de jî bêjeyên Quranî digel wateyên wan ên erebî bikar anîne. Dîsa hin sûre wekî jimara ayetên wan lê hin sûre jî tenê hin ayetên wan daye ber xwe. Herwiha di manzûmeya xwe de hin sûre qet cî nedayê hin sûre jî tenê cî daye ayetek du ayetên wê. Wekî mînak; di vê xebatê de nivîskar tenê cî daye heşt û neh sûreyan, bîst û pênc sûre jî di berhemê de cî nagirin. Ew sûreyên neketine berhemê ev in: “Enfal, Îsra, Şû’era, Enkebût, Secde, Sebe, Saffat, Fûssîlet, Şûra, Zûxrûf, Casiye, Mumtehîne, Seff, Munafîqûn, Texabûn, Telaq, Tehrîm, Nûh, Înşîrah, Qedr, Tekasur, Esir, Qureyş, Kafîrûn û Nesr.”

Em ê niha yek bi yek bi mînanan li ser rawestin.

3.2.1. Wergera Bêje ji Bêjeyê

Nivîskar di hin malikan de bêjeyên erebî yên ayetên Quranê bi kurdiya wan nivîsiye û bi vî awayî bêjeya orjînal û wateya wê ya kurdî bi hev re daye. Mînak:

2/7 Munafîqin kerr û lal in hem kor in
 äümmun û hem bukmûn û hem jî ‘umyun

2/8 äeyyîb; re’d û baran û dengê ‘ewra
 Berq; birusk, şewa’îq; agirê wa

Herwiha di hin malikan de bêje bi hev re yan jî di nav hev de bi erebî-kurdî hatine nîşankirin. Mînak:

2/15 Qale gotî Ademu te enbî’hum
 Navê eşya ji wan ra bêj esmaehum

2/230 Qalu go semî’na me dengê te kir
 We ete’na me weke emrê te kir

3.2.2. Wergera Hevok Ji Hevokê

Carna jî nivîskar hevokeke erebî wergerandiye ku ew bi hevokeke kurdî diyar kiriye.

Mînak:

2/88 Felenuwelîyenneke qibleten
Muheqqeq em berê te didin qibleten

2/232 Wela tehmîl ‘eleyna îşren kema
Bargiran lime neke wek berya me

11/2 Feyekîdû leke keyden xîleten
Wê li te çêkin hîle û pilan xîleten

3.2.3. Wergera bi Şiklê “Ravekirina Bêje yan jî Îfadeyekê” de

Nivîskarê berhemê carna hin bêje yan îfade bi çend bêje yan jî îfadeyan rave kirine. Herwiha carna hin bêje û têgihên Quranê bi çend malikan rave kirine. Wekî mînak; di Besmeleyê de û di sûreya Fatiheyê de piranî hin têgihên ayetan rave kirine. Mînak:

1/1 Bi navê wî Xwedayê ku rehma
Li dunyayê rehmq dikî li însana

1/5 Me hîdayet ke şîraţel musteqîm
Ê te nî’met kir en ‘emtu ‘eleyhîm

1/6 Ew nebî û hem şiddîq û şehidin
Şalihîn û ew tamam xweş refîqin

1/7 Ne riya mexdûb û yehûdê le’în
Ne riya wa filehê êallîn û mudellîn

1/8 Me’neya amîn ev e her tekrar ke
Ya îlahî vî di’ayê qebûl ke.

Dîsa; bo nomûne, dema behsa “Hûrûfên Mûqataa” kiriye ew bi çend malikan rave kirine:

- 2/1 Ew hûrûfê serî surete qur’an
Muqetçe’e; kes nizanî me’na wan
- 2/2 Geyrê Xwedê ku xaşî ‘ilmê Wî ne
Elîf Lam û Qaf û Nûn û Tasiîn e.

3.2.4. Pêşxistina Kurdî ser Erebî

Di hin malikan de nivîskar berî bêje an jî îfadeya kurdî daye paşê jî wateya wî ya erebî daye. Mînak:

- 1/2 Xwedî ‘alem yanî rebbîl ‘alemîn
Xwedî axîret malîkî her yawmîd-dîn
- 2/3 Bê şek û bê şubhe ye La reybe fih
Yuqînune; yu’mînun amene bîh
- 2/4 Çi bitirsîne çi jê netirsîne
Eenzer emlem tunzîr nâînîne

3.2.5. Wergera ‘Erebî ji Kurdî

Di berhemê de, di malikên duzimanî de piranî pêşî bêjeyên erebî dûre wateya wan a kurdî tê dan. Mînak:

- 2/6 Xetemellahu: muhirkirî qelbê wan
Gîşawetun; heye perda çavê wan
- 3/15 Înned dîne ‘îndellahîl Îslam
Dîne heq li cem Xwedê her Îslam

7/2 Beyaten ey baîtîne di xew de
Qaîlûne wextê di nîvrû di xew de

7/3 Me'ayîşe esbabî me'îşetê
Ji xwarin û vexwarin û kîswetê

3.2.6. Wergera Erebî ji Erebî

Nivîskar di gelek ciyan de malikên erebî bikar anîne ku bêjeyên Quranî digel wateyên wan ên erebî bikar anîne, jixwe di dawiya berhemê de, di sûreyên kurt de hema bêje qet kurdî bi kar naîne û tenê bi erebî malik nivîsîne. Mînak:

2/84 Weseten beynel ifratî we tefrit
Weseten beynel xuluwwi we teqsîr

2/85 Weseten beyne sultanî wel wîcdan
Weseten beynel 'uqulî wel qur'an

8/38 Ella ye'lemû lî enla ye'lemû
Emrû hukmî kîtabî la ye'lemû

36/1 Esxentumû: exleztum fî qetlîhîm
Fe şuddul weâaqe ey fe'sîrûhum

36/2 Muteqelleb: e'malekum fid-dunya
We meâwakum: menzîlekum fil uxra

36/3 Sewwele: zeyyene, sehhele lehum
We emla ye'nî medde emalehum

27/1 Muxtalîn bi me'na mutekebbîrîn
Îlla kullu xettarîn ey geddarîn

27/2 Ûlûl 'ezmî / uswetun heşenetun ey qudwetun
Sunnetun şalîhetunheşenetun

Ji bilf van malikên ku me ji berhemê mînak dan hin malik jî hene ku têkiliya wan rasterast bi ayetan re nîne. Mînak:

2/234 Men qeree ayeteynî mîn beqer
Wê şevê besî wî ye got pêxember

Dîsa ev malikên li jêr ên dawiya berhemê jî ji hemdele, selwele, şîret û dîroka nivîsandina berhemê pêk tên:

89/5 Hemden lillahî ‘ela in’amîhî
We şelatullahî me’e selamîhî

89/6 Lî hebîbillahî xeyrîl xelqîhî
Muhemmedîn alîhî we şehbîhî

89/7 Mecmu’etul tefasîr ji tefsîrî
Eşle ji bo nan û behar û tefsîrî

89/8 Hetta tê xilas nekî kitêbekî
Pê nikarî bikî î’tirazekî

89/9 Çarşed û bîstu sê piştî hezar
Ji hîcretê bû tarîxa nûbihar.

Wekî ku mînakên li jor jî diyar dibê Nûbihara Quranê wekî manzûmeyeke kurmancî erebî ciyê xwe di nav manzûmeyên kurdî de girtiye. Lê divê em vê jî bêjin ku ev manzûme ji aliyê wergerê ve ne xwediyê rê û rêbazeke yekgirtî ye. Nivîskarê vê menzûmê di serî de bi kurdî erebî, hin caran bi erebî erebî, di dawiyê de jî piranî bi erebî erebî berhema xwe nivîsiye. Di hin malikan de bêje û hevok hatine wergerandin di hinan de jî hatine rave û şîrovekirin.

Li aliyekî din ji 114 sûreyên Quranê tenê 89 sûre di berhemê de cî digirin. Ev sûre jî piranî ne hemî ayetên wan cî digirin. Nivîskar ji van sûreyên ku xistiye berhema xwe; hinek têgih û îfadeyên ayetên wan daye ber xwe û kurdî yan jî erebiya wan digel wan daye.

ENCAM

Me di vê xebata xwe de ferhengeke menzûm a kurdî/kurmancî ji aliyê ruxsarî û naveroka wê ve vekola û ciyê wê ya di Edebiyata Kurdî de derxiste pêş. Ev ferhenga menzûm a bi navê Ferhenga Quranê ya Mela Mehmûdê Tîruwayî; yekemîn ferhenga Quranê ya menzûm e ku bi kurdî-erebî ye.

Xebata me ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de me behsa ferhengnûsî, dîroka ferhengê, ferhengên menzûm û ferhengên menzûm ên kurdî kir. Di beşa duwem de me cî da jiyan, berhem û kesayeta edebî ya Mela Mehmûd. Di beşa sêyem de jî em li ser *Ferhenga Quranê* ya ku mijara xebata me bû, sekinîn. Di dawiyê de jî me metna latînî digel destxeta ferhengê bi cî kir û bi vî awayî me xebata xwe kuta kir.

Di vê xebata xwe de, em tesbîten xwe yên di derbarê Ferhenga Quranê de dikarin wiha diyar bikin:

1. Bi minasebeta vê xebatê hate dîtin ku heta niha 8 ferhengên menzûm ên kurdî hene. Ji van 2 soranî û 6 jî kurmancî ne. Bi zazakî û goranî ferhengeke menzûm nehatiye dîtin. 8 ferhengên menzûm ên kurdî li hember sê zimanan hatine amade kirin. Ew ziman jî erebî, farisî û tirkî ne.

2. Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de kevneşopiya ferhengên menzûm ciyekî taybet digire. Bi 8 berhemên xwe ji gelek cûreyên edebî yên klasîk bêtir û pêşdetir e. Ev tradisyona xurt bi Nûbehara Biçûkan dest pê kiriye kudi sala 1683an de hatiye weşandin û ya dawî jî di sala 2015an ji aliyê Dilbikulê Cizîrî ve hatiye amadekirin û çapkirin. Bi vê tespîtê em dikarin bêjin ku tradisyona ferhengnûsiya menzûm di kurdî de 332 sal e, jîndar e, zindî ye û berdeyam e.

3. Hin ji van 8 berhemên ku me qala wan kir hatine çapkirin hin ji wan jî nehatine çapkirin. Herwiha hin ji wan tenê bi elfabeya ‘erebî li başûrê Kurdistanê hatine çapkirin, hin ji wan jî him bi latînî û him bi elfabeya ‘erebî hatine weşandin. Hin ji wan jî tenê bi elfabeya latînî hatine weşandin. Ya ku em li ser rawestiyên jî ya Mela Mehmûd Tîruwayîbû ku heta niha nehatiye çapkirin. Taybetiyeke pir mezin a vê ferhenga ku bû mijara teza me jî ew bû ku destxet bû û cara ‘ewil bi vê xebatê hate latînîzekirin û vekolîn.

4. Weke hemû ferhengên menzûm ên kurdî ferhenga Mela Mehmûd Tîruwayî jî ilhama xwe ji ferhenga Ehmedê Xanî girtiye û di binê bandora wî de maye.

5. Yekem ferhenga Quranê ferhenga Mela Mehmûd Tîruwayî ye. Ji vî aliyê ve jî gelekî bi qîmet e. Ji ber ku ferhenga Quranê ye têgeh û formên ‘erebî gelekî hatine bikaranîn.

6. Ji ber ku helbestkî ye, bi hêsanî dikare bête jiber kirin. Ev jî ji bo perwerdehiyê karê xwendevanan hêsantir dike.

7. Nivîskar di ferhenga xwe de zêdetir li ser peyv û qalibên Quranê yên ku jiberkirina wan zor in sekiniye.

8. Di ferhengê de zimanê kurdî û erebî hatiye bikaranîn û wateyên kurdî yên peyvên Quranê ên erebî hatiye pêşkeşkirin lê di dawiya xebatê de malikên erebî-erebî jî balê dikişînin ku ev duzimaniya berhemê lawaz dike.

9. Di vê xebata nivîskar de hemî sûreyên Quranê cî nagirin. Herwiha di sûreyan de jî her ayetên wan cî nagirin. Ev jî wekî kêmasiyeke din a berhemê dikare bê dîtin.

METNÊ FERHENGÂ NÛBIHARA QUR'ANÊ

1. Suretê Fatihê

r. 1.

- 1/1 Bi navê wî Xudayê ku rehma:
Li dunyayê rehmê dikî l insana
- 1/2 Xwedî 'alem yanê rebbi`l-'alemîn
Xwedî axret: maliki her yewmî`d-dîn
- 1/3 'Ibadetê me`j bona te`b tenê ye
Heşr û qeşra ne`budu iyyake ye
- 1/4 Neste`înu: her ji te em dixwazin
Arîkarî her ji te ne`b kesê din
- 1/5 Me hidayet ke şirate`l-musteqim
Ê te ni`met kir: en`emtu `eleyhim
- 1/6 Ew nebiy yû hem şiddîq û şehid in
Şalihîn û ew tamam xweş refîq in
- 1/7 Ne riya megdûb û yehûdê le`în
Ne riya wa filehê dâllîn û mudellîn
- 1/8 Me`neya amîn ev e her tekrar ke:
Ya Ilahî! vî di`ayê qebûl ke

2. Suretê Beqerê

- 2/1 Ew hûrufê serî suretê Quran
Muqet`te`e; kes nizanî me`na wan
- 2/2 Ğeyrê Xudê ku xaşî `ilmê Wî ne
Elîf lam û qâf û nûn û ta sîn e.
- 2/3 Bêşek û bêşubhe ye lareybe fîh
Yuqînûn e: yu`mînun amene bîh
- 2/4 Çi bitirsîne çi jê netirsîne
Eenzer emlem tunzîr nâînîne
- 2/5 Xetemellahu: muhirkirî qelbê wan

- Ğiřawetun: heye perda çavê wan
- 2/6 Munafiqin ker rû lal in hem kor in
Şummun û hem bukmûn û hem jî ‘umyun
- 2/7 Şeyyib: re‘d û baran û dengê ‘ewra
Berq: birusk, şewa‘iq: agirê wa
- 2/8 Xudê zanî bi her ھalê kafira:
Wallahu muھîtun li ser tim kafira
r. 2.
- 2/9 Yekadu: hindik dimînî ku derxî
Yextefu ebşarehum: çawa derxî
- 2/10 Hûn şerîka qeţ çênekin ebeden
La tec‘elu lillahî hûn endaden
- 2/11 Ger nekin ji xwe hûn nikarin qeţ bikin
În lem tef‘elu len tef‘elu nakin
- 2/12 Bîne bîra xwe ku Rebbê te gotî
Îz qale rebbuke li`l-melaîketî
- 2/13 Ma tê çêkî ê ku yesfiku`d-dima’
Xûnê birijînin bi geyrê heqê wa
- 2/14 Qale gotî Ademu te enbî’hum
Navê eşya`j wan ra bêj esmaehum
- 2/15 Hûn bixwin rizqê fireh ey regeden
Heşu şî’tum çawa dixwazin ebeden
- 2/16 Qul nehbiţû be‘dukum hûn libe‘din
Herin xwarê hûn ji hev ra neyar bin
- 2/17 Feteleqqa Ademu min rebbihi
Kelimatin fetabe we ‘eleyhi
- 2/18 ‘Elimî Adem ji Rebbê xwe kelîma
Bi wa kelîma tewbe qebûl bû hema
- 2/19 We îyyaye bal mi ve hûn: ferhebûn
Ji geyrê min hûn ji kesî neşirsin

- 2/20 Ey gelî zarûyê Ye‘qub Israîl
Xiṭaba Quranê yā benî Israîl
- 2/21 Dianîne serê we pîsî ‘ezab
We yesumû nekum sûe`l-‘ezab
- 2/22 Dikuştin lawikê wa: ebnâekum
We yesteḥyûne: dihişt nisâekum
- 2/23 Bîne bîra xwe ku me şeq kir beḥr
Musa îz fereqna bikumu`l-beḥr
r. 3.
- 2/24 We ‘ibadetê golik kir ‘ecele
Şumme: piştra îttexeztumu`l-‘icle
- 2/25 Werin hûn tewbe bikin ila rebbikum
Tûbû ila bari ikum rebbikum
- 2/26 Men nû selwa gez zû guşî suska
Qûlû bejin hiṭṭetun me ‘efuka
- 2/27 Av derket û her kê: fe în feceret
Wela te‘şew nekin fesad li kesekî
- 2/28 Ihbiṭû mişren herin nava mişrê
We bâû bûn musteḥeqê gedebê
- 2/29 Ellezîne hadû: ê yehudî ne
We`n-neşara: fillehê mesîḥî ne
- 2/30 Şabiîn jî ‘ibadê sitîrana
Ne filleh û yehudî nabinîne
- 2/31 Bîne bîrê ser soz ji westandiye
Îz exezna mîşaqekum gotiye
- 2/32 Werefê‘na fewqekum e`t-tur e
Me hilda serwe zêde çiyayê tur e
- 2/33 Kûnû teyyîbîn qîredeten xasiîn
Hûn bibin meymunê zelil ey xayîn
- 2/34 Fece‘elnaha nekalen mew‘îzeh

Bûne 'ibret ji bo 'alem mew'îzeh

- 2/35 Eettexîzûna huzuwen nekî
Ey Musa! ma ti heneka`b me dikî
- 2/36 Beqeretun yek çêlek la fariqun
Wela bikrun 'ewanun bî 'ariqun
- 2/37 Ne pîr û ne piçûk û lina beynî
Zerê zer şefrau faqi' rengê wî
- 2/38 Wela tesqi`l-herse ev ne kişandibî
Tuşîru`l-erde çêlek çot nekiribî
r. 4.
- 2/39 Bê 'eyb û kêmayî, musellemeh
Yek reng û bê deq jê bê laşiyeh
- 2/40 Fedda re'tum li me'na fexteleftum
Ji bo ê we kuştibû îz qeteltum
- 2/41 Qalû: gotin etuħeddişu nehum
'Atibîne efetuxbirû nehum
- 2/42 Bîma: ew weşfê Eħmed li tewratê
Feteħellahu 'eylekum: ku gotî
- 2/43 Ummîyune: ew cahil in nezan in
Ĝeyri emaniyye: qewlê bê 'eşl in
- 2/44 Hewirdorê wî bigrî gunahi wî
We eħatet bihî; agir cihê wî
- 2/45 Şumme: piştre teweleytum Yehudê
Vegerandin wechê xwe ji emrê Xudê
- 2/46 We entum: hûn mu'riqune ey yehud
'Edeta we ev e her neqda 'uhud
- 2/47 We qeffeyna: me şiyand yek li du yekî
Teqtulune: we dikuştin qismekî
- 2/48 Qulubuna: qelbê me ğulfun heye
Hatî girtin qelbê me bi perdê ye

- 2/49 Teleba fethê dîkin: yesteffîhûn
Bi nebiyyê muntezer yestenşurun
- 2/50 Gelek pîs e ew tiştê wa firotî
Bi inkarê bî'sema îşterew bîhî
- 2/51 Febaû bî gēdebîn 'ela gēteb
Heqkirin wan yek li du yekî gēdeb
- 2/52 We uşrîbu: ketibû nav qelbê wa
Hubba 'ibadetê golik li cem wa
- 2/53 Qul: ti bêje bî'sema ye'murukum
'Ebdê golik çî pîse îmanekum
r. 5.
- 2/54 Letecîde`n-nekum ew eħreşe`n-nas
Herîşin li ser dunyayê ji herkes
- 2/55 Wema huve bîmu zehzihihi nabî
Ji 'ezabê cehennemê we`xlaş nakî
- 2/56 Nebezehû ferîqun sûz şikandin
Neħnu bûne imtiħan em fitnetun
- 2/57 Ma hum biđârîn bihi min eħedin
Ew nikarin qeť zararê li kes bikin
- 2/58 Wemalehu fi`l-axiretî min xelaq
Jê re nîne axretî neşîb û heq
- 2/59 Şewabûn lemeşubetun qûlûnzurna
Ey nebî guhdarîke`l me meyzîne
- 2/60 We 'efuke fe'fu terke feşfeħu
Guh nede wa emrî qeble`l-cihad bû
- 2/61 Tilke ev gotinê batil û derew
Emaniyyu temenî hêvîyê derew
- 2/62 Hatu bînin delîl û burhane kum
Eger hûn rastî dibêjin in kuntum

- 2/63 Wemen maki ezlemû zalimtir e
Ji wî kesî ku men‘a mescîd kire
- 2/64 En yuzkere ku zîkrê wî bêkêr in
We se‘a bişuxulî ji bo xerabkirin
- 2/65 Ne heqê wa ye ku daxilê wî bin
En-yedxulu illa xaif mu‘minîn
- 2/66 Yan bitirsî zalim ji beşsa mu‘mina
Ku meni‘ kî zîkrê mescidê wana
- 2/67 Kullun lehû qanîton ey ‘abidun
Temamî wa ji Xudê ra yexde‘un
r. 6.
- 2/68 Xaliq û munşi‘ê ewwel bedi‘e
Kû neçî ser dînê wa nettebi‘e
- 2/69 Maleke nînin ji te re dost û neşîr
Minellahî te xilaskî ji se‘îr
- 2/70 Beyt avabû ji bo cem‘a insanan
Maşabeten li`n-nasi û we emnen
- 2/71 Ji bo hecc û ‘umre ê li hev bibne kom
Bighê şewaba mezin emna ‘umum
- 2/72 Me emrê Ibrahîm kir we ‘ehîdna
Ji me re bêjî êrina menasîkna
- 2/73 We men yergeb itiba‘ê pê nakî
Ma kî dînî Ibrahîm qebûl nakî
- 2/74 Îlla men sefihe nefseh kiriye
Geyrê ê xwe pîs û zelil kiriye
- 2/75 Leqedîş tefeynahu me neqadî
Zar wî zar wa nevîne welesbatî
- 2/76 Feseyekfike bes nîne Ellah
Wî ji bo te`j heqê wa derî Ellah
- 2/77 Hûn bibin tabi‘ê wî dînê Xudê

Şibgetellahî rengê dînê Xudê

- 2/78 Qul tê bêje wa etu haccûnena
Ma di heqê Xudê qey tucadîlna
- 2/79 Tilke ew ummetek bûn weqed xelet
Çûn û derbas bûn leha ma kesebet
- 2/80 Seyequlu sufeha' u dibêjin
Ma wella hûm ji ber çî qulibandin
- 2/81 Ey ummeta Muhammed hûn ummeten
Geyrê ummeta ummeten weseten
- 2/82 Weseten 'edlen xîyaren xeyre dîn
Xudê 'ilm û 'emel û şer'a mubîn
r. 7.
- 2/83 Weseten beynel ifraî we tefriş
Weseten beyne`l-ğuluwwi we teqşîr
- 2/84 Weseten beyne`l-sultânî we`l-wîcdan
Weseten beyne`l-`uqlî we`l-Quran
- 2/85 Yenqelibu: ji wa kesê kud fegerî
'Ela 'eqîbeyhî ser dînê berê
- 2/86 We in kanet lekebireh
Muheqqeq ev emrê qiblê kebîr e
- 2/87 Felenuweliyenneke qibleten
Muheqqeq em berê te didîn qibleten
- 2/88 Hûn li ku bin li wir heysû ma kuntum
Ber bidinî: fewellu wucuhekum
- 2/89 La tekunenne mine`l-mumterîn
Ey Muhemmed tu nebe şakîn
- 2/90 Li utimme da tamamkim ni'metî
Imamen we qaîden bi rehetî
- 2/91 Muheqqeq em ê we her imtihan kin
Felenebluwennikum: tecrûbekin

- 2/92 Inna lillahi bêje el-muşîbetî
Em ‘ebd û hem mal û hem mulkê Xudî
- 2/93 We inna: em ileyhî tev raci‘un
Roja heşrê vegera me cem Wî bûn
- 2/94 Yel‘enuhûm: le‘netê li ehbara dîkin
La‘inune: ins û cin û melekin
- 2/95 Beşse fiha mîn kullî dabbetîn
Li ser erdê her mexluq belavkirin
- 2/96 We teşrifi`r-riyaḥî we`s-seḥabî
Qulbandina ba û ‘ewr es-seḥabî
- 2/97 Îz: lî heşrî teberre e: berî bûn
Ellezînet-tubi‘u: meznê wa bûn
r. 8.
- 2/98 Ellezînet-tebe‘u: xelqê wa bûn
Teqette‘et: ‘elaqê wa j`ev quṭ bûn
- 2/99 Neteberre’: em xwe bîrîkin kema
Teberre‘u: ew berî bûne ji ma
- 2/100 Bel: belkî nettebi‘u ma elfeyna
Ey wecedna ‘eleyhî abaena
- 2/101 Ew şivanê go di bakî: yen‘iqu
Ew heywani fêm nakî la yesme‘u
- 2/102 Wema uhillê bihi li Ğeyrillah:
Zebḥa qurbanê bi navê ğeyrê Ellah
- 2/103 Femenît turre guneh nîne tê de
Di ḥalê idtirar û tengiyê de
- 2/104 Fema: çî eşberekûm ‘ele`n-narî
Ecreehûm bi ‘emelê ehli narî
- 2/105 Lefî şîqaqin: xilafin we niza‘
Be‘idin: dur in ji heq di nav niza‘
- 2/106 Fî`l-be’saî: feqr û tengiya malê

Wedderaî: meredû êşa canê

- 2/107 Wextê herbê tê gotin hîne`l-be`sî
Şebra şadiq fî`l-be`saî welbe`sî
- 2/108 `Efû bikî: `ufiye lehû mîn exîh
Ji terefê birayê meqtul min exîh
- 2/109 We edaun ileyhi bî ihsanin
Xwînê bidin biqencî wî eda kin
- 2/110 Welekum fî`l-qîşasi heyat heye
Ji we re`d qîşasê da mayîn heye
- 2/111 Go hem qatil hem meqtul sag dimînî
Ev ewcezi hukmi cezaê dînî
- 2/112 Femen kesî şehîd: ji we hazir bî
Felyeşumhu: bila wî rojiyê bikrî
r. 9.
- 2/113 Fe`iddetun mîn eyyamîn uxere
Hewqase roj ji piştra feza bigre
- 2/114 Da qeza kin rojî go hûn fitirîn
Li tukmilul `iddete: roj timam bin
- 2/115 Ucîbû de`wete`d-da`i iza de`an
Ez bi a we d`kim ku hûn dikin di`an
- 2//116 Hûn ji imanê bînin bi amîn bikin
Bi ta`et felyestecîbû lî bikin
- 2/117 Uhîlle helal bû leyletes şiyam
Errefeşû cîma`a şeva şiyam
- 2/118 Ew ji we re sitarin: hûnne libas
Hûn ji wa re sitarin: entum libas
- 2/119 We tudlû ey wela tulqû kes nedî
Malê xwe ile`l-hukkamî bi rişwetî
- 2/120 Yeseluneke `enil ehille dikin
Ew suala hal û şeklê heyvê dikin

- 2/121 Qul: tê bêje hiye: ew mewaqîtu
Ji bo insana hesab dikî weqtu
- 2/122 Weqtuluhûm heysû seqîf tumuhûm
Wa bikûjin li ku weced tumuhûm
- 2/123 Fe'tedu 'eleyhi hûn bi mislê ma
Tecawuzê bikin hûn jî weke wa
- 2/124 We enfiqû hûn malê xwe b'din lillah
Hûn bi destê xwe xwe navên tehlukeh
- 2/125 Bi eydikûm bi me'na enfusekum
Tehluka jî bexîltî li dînikum
- 2/126 We etimmu hec û 'umreî lillah
Ger uşirtum muni'tum hedyen lillah
- 2/127 Femen: kesî ferede: niyet biki
Fela: niye jê re qet nika biki
r. 10.
- 2/128 Refes: cima' fusûq: gunah û cidal
Feşş û 'işyan nabî jê re qet cedel
- 2/129 Hûn zadê xwe hazir kin: wetezewwedu
Xeyrê zada ne xwestin ji xelkî bû
- 2/130 An jî hazir kin zadî ji bo axretê
Teqwatî ye xeyrê zadê axretê
- 2/131 En tebtexû ye'nî fi en tetlubû
Fedlen mîn rebbîkum ey tettecîru
- 2/132 Fe îza efedtum hûn veqerriyan
Ji 'erefatê herin meş'erîl heram
- 2/133 Eyyami teşrîq we eyyami mina
Eyyamîn me'dudatin li zikrina
- 2/134 Hacı go 'ecele kir roja da
Recma şeytan kir di rojî teşrîqa da

- 2/135 Ew kesê te‘eccele fî yewmeynî
Fela işme nîne gunehî yewmeynî
- 2/136 Wehû we minafiq ele`d-dul xişam
Neyarek zor e şedîdul xişam
- 2/137 Exezethu`l-‘izzetu: kibrî dikî
Bilişmî inadê guneh pê dikî
- 2/138 Feşesbuhu: cehennem besî wî ye
Wele bî’sel mihad: çi pîs cî ye
- 2/139 Men yeşrî nefsehûb tigae merdat
Êm nefsa xwe da`j bo riða ‘û merdat
- 2/140 Udxulu fî`s-silmî werin kaffeten
Musluman bin zâhiren we batinen
- 2/141 Musluman bin di helal û heram da
Musluman bin di şer’ û di eḡkam da
- 2/142 Heta gotin meta kengî neşrullah
Nişreta dîn wê kengî bikî Ellah
r. 11.
- 2/143 We`l-fitnetu: zilmû û serdestî û celî
Şirk û we belîyû ekberu mînel qetlî
- 2/144 Ulâike hebiţet e’maluhum
Betal bû qebûl nabî e’maluhum
- 2/145 Ma za çawa yunfîqun xeyra bikin
Qulîl ‘efwe tiştê zêdeyî xwe bidin
- 2/146 Qul: tu bêje işlahûn xeyrun lehum:
İşlahâ malê yetîm jê re xeyrun
- 2/147 Ye`lemu`l-mufside mine`l-muşlîhî:
Mufsidê malê yetîm ji muşlîhî
- 2/148 Welew şaellahu le e’netekum:
Meşeqqet û tengî ne kir rebbekum.

- 2/149 We yes eluneke ‘enîl meħîdî:
Sual dîkin ji cima‘a fî`l-ħeydî
- 2/150 Hûwe ezen fe‘tezilûn nisâe:
Ew ezyet e hûn xwe durkin ji nisâe
- 2/151 Fe’tuhûnne mîn ħeysu emerekum:
Herin cem wa bi wechê ħelal bî lekum
- 2/152 Jin ‘erdê çandinê hersûn lekûm
Fe’tu enna şî’tum: keyfe şî’tum
- 2/153 Navê Xudê nekin ji xwe re ‘urdeten
Lê ji bo na eymanîkum firşeten
- 2/154 Nekin sebeb ku men‘a xêrê bikin
En teberru: ku hûn xêrê pê bikin
- 2/155 La yuaxîzu kumullah bi`l-leğwî:
Xudê`l we nagrî bi wa şondî leğwî
- 2/156 Ewî go îla’ kirine: yu’lune
Terebuşû: ji wa re heye bisekine
- 2/157 Feimsakun: in mayîn bi xweşî
Ew tesrihûn: an berdana bi qencî
r. 12.
- 2/158 La: nekin tetteşîzû ayatillah
Huzuwen: istihzae bi ayatillah
- 2/159 Fela hûn meni’ nekin: te’duluhûnne
Ku nikaħ kin carek dî: ezwacehûnne
- 2/160 Şîr bidin wa ħewleynî kamîleynî
Di salê kâmiline wextî şîr danî
- 2/161 Ellezîne yuteweffewne dimrin
Yeterebbeşne ji nîwa wî biseknin
- 2/162 Erbe‘ete eşhûrîn hem we ‘eşren:
Çar meh û deh rojê wî ne ‘iddeten
- 2/163 Ĥetta yebluğel kitabû eceleħ:

Ta xilas bî 'iddetî ferð eceleh

- 2/164 Mettî'û hûnne: meta' malek bidin
Musi': zengîn, muqtir feqîr jê bidin
- 2/165 Qed feredtûm e hûnne ferîdeten
We ji wa re te'yîn kiribî şidaqen
- 2/166 We en te'fû eqrebû ew li`t-teqwa
Dana timamî mehri nîzê teqwa
- 2/167 Hâfîzu: hûn eda bikin limêjê
Bi adab û heq û wextê limêjê
- 2/168 We şelatî`l-wusta limêja 'esrê
Qanîfîne xaşî'ine bi şebrê
- 2/169 Fein xiftûm ferîcalen: li me jî
Ew rûkbanen: bi suwarî ne meşî
- 2/170 Ew ulufun hezerel mewtî:
Bi hezaran derketin ji tirsî mewtî
- 2/171 Men zel lezî yuqrîdullahe qerden
Ma kî heye ji bo Xudê bide deynen
- 2/172 Hel 'eseytum in kutîbe 'eleykûm
Ma hûn ê cihad bikin ferz bî lekûm
r. 13.
- 2/173 'Eleyhîmu`l-qitalû tewellew illa
Ferz bû cihad meni' bûn gey qelîla
- 2/174 Qalû enna yekunu lehu`l-mulk
Çawa wê bibî mezin û mulûk
- 2/175 Welem yu'te se'eten mine`l-malî
Ne zengîn e nîne heyîna malî
- 2/176 Innellahe mubtelîkûm bineher
Xudê we tecrube b`kî bi ava neher
- 2/177 Kem çîqa min fietîn qelîletîn
Pir cema'eti piçûk gelebet kirin

- 2/178 Ellahû heyyun qeyyumûn qaim e
Bi tedbîra emrî mexluqat û me
- 2/179 Nîne jê re sinnetûn wela newmûn
Sinnetûn xilmaşbûne berya newmûn
- 2/180 Men zellezî yeşfe'û ew 'inde hû
Ma kî karî şefa'et ki 'inde hû
- 2/181 Ye'lemû zanî ma beyne eydîhîm
Emr li ber wa û li pişt wa xelfehûm
- 2/182 Wela: ne yuhtûne: ew nizanin
Bişeyîn min 'ilmîhi: bê ızna wîn
- 2/183 Wesi'e kursîyyu hu`s-semewatî:
Kursî mestir hewirdorê wa girtî
- 2/184 Ji heft qatî asiman û heft 'erda
An ji kursî mulk û 'ilm û qudreta
- 2/185 Wela: nîne zor û te'dadî'l Xudê
Yeûduhu: hifza asiman û 'erdê
- 2/186 Wehûwe: her Ew e 'elîyyû`l-'ezîm
Ê bilindi dur ji şirkê, ê mezin
- 2/187 Femen yekfûr bi`ţ-ţaxutî: red bikî
Riya şeytan û eşnama red bikî
r. 14.
- 2/188 Tağut men'a dîn û şer'ê her dikî
Emrê xwe jî bi zorê tetbîq dikî
- 2/189 Tağut dibê ku şexsekî me'lum bî
An rahib an zalim an jî meclis bî
- 2/190 Feqedîstemseke wî bi`l-'urwetil
Wuşqa: girtî bi qulpa aşî hebil
- 2/191 Elem tere: ma te nedî, ellezî
Ew Nemrudî hacce xaşemellezî
- 2/192 En: ji bo ku, atahullahu`l-mulk

Xudê dayî mal û quwwet û mulk

- 2/193 Teheyyere buhîtellezî kefer
Hetikî meglûb bû Nemrudê fecer
- 2/194 We hîye xawîyetûn: qalew ketî
‘Ela li ser ‘uruşîha: ban ketî
- 2/195 Qale enna yuhyî hazihillehu
Çawa saxkî piştî mirin`Ellahu
- 2/196 Lem yetesenneh: xira nebû
Nunşizuha: me hestî rast kirîbû
- 2/197 Feşurhonne: wa kedî bike bi‘elimîne
Şummed ‘uhunne piştire ba ke wane
- 2/198 Kemeşelîn hebbetîn hem embetet
Weke hebbek şîn bibî, bibî heft şed
- 2/199 Wellahû yuda‘ifû limen yeşa’
Xudê xêrê didî qat qat ê yeşa’
- 2/200 Şumme la yutbî‘une piştire nakin
Menna minnetû wela ezen nakin
- 2/201 Qewlûn me‘rufun xeyrun mîn şedeqeh
Gotina xweş bi xêrtir e ji şedeqeh
- 2/202 Ji wî xêra ku yetbe‘uha ezen
Piştî xêra bi minnet û ezyeten
r. 15.
- 2/203 Kemeşelî sefwanin: tehta şayîk
Eşabehu wabilun: tavî libik
- 2/204 Şelden: axa li ser tehtê paqijkî
Ev mişala ‘emelî`b riya bikî
- 2/205 Kemeşelî cennetîn birebwetîn:
Wek bexçekî ku cihê wî bilindbin
- 2/206 Featet ukuleha hem di‘feynî:

Fêkî didî hatina wî mişleynî

- 2/207 In-lem yuşibha wabilun feţellun:
Ku barana ţaviya ne wî xunafun
- 2/208 Eşabehe`l-kiberu ixtiyar bî
Zuriyyeten du`efau: xwîy `iyal bî
- 2/209 Eşabeha i`şarun fihi narun:
Bi ser de bî bayekî germ wek narun
- 2/210 Wela teyemmemu`l-xebîse min hu:
Malê xwe pîs nekin zekaten min hu
- 2/211 Lestûm hûn bi axizihî: nagirin
Ku malê we li cem yekî bî wî bidin
- 2/212 Îlla en tuğmidû fihi: deynekin
Îlla ku hûn çavî xwe ji wara bigirin
- 2/213 Eş-şeytanu ye`idukumu`l-feqre
Hûn ê feqîr bin ku hûn bikin xêra
- 2/214 Ye`murukum ew amîra bi`l-feħşa`
Men`a zekatê`w bexiltî ye feħşa`
- 2/215 În tubdu`ş-şedeqatî feni `imma
Dana xêra li ber çava xweş xêra
- 2/216 Lilfuqerai`l-lezîne uħşirû
Şedeqe`j bona ê lillah cahedu
- 2/217 La yesteţî`une derben fi`l-erđî
Ew nikarin sefera bikin li erđî
r. 16.
- 2/218 La nakine yeselûn nase ilħafa
Xweşinî nakin ji insana ilħaħa
- 2/219 Ellezî yetexe`b-benu`ş-şeytan
Ehlî selef weke ê lixê şeytan
- 2/220 Înneme`l-bey`û kirîn mişlu`r-riba
Ew dibên danûstandin weke riba

- 2/221 Yemhequ`l-lahu`r-riba her wê bibî
Xebîr û berke ji malê selefê dibî
- 2/222 We yurbî: zêde qebûl bereket dikî
Şedeqatî: xêr û deyna wî bikî
- 2/223 Fe`zenû bi herbîn hûn minellahî:
Hâzir bin ji bo herba wî û resûlihî
- 2/224 We in tubtum: ger tewbe bikin, felekûm:
Ji wer helal e ruûsû emwalîkûm
- 2/225 În kane zû usretin fenezîretûn:
Eger deyîndar feqîr bî muhletî bikin
- 2/226 Îza: wextê tedayentûm bideynin:
We bi deyn da hev wê deynî binivîsin
- 2/227 Bikî beyan binivîsin we`l-yumlîl
Wela yebxes: kêr nekî yazkî kamil
- 2/228 Wela ye`be: meni` nebin her bikin
Wela tesemû: sist nebin yazbikin
- 2/229 We in tubdu: çi zahirkin çi nekin
Ew tuxfûhu hesabê wa bê kirin
- 2/230 Qalu: go semi`na: me dengê te kir
We ete`na: me weke emrê te kir
- 2/231 Xêra kirî jê re ye: ma kesebet
Şerrê kirî jêr me: mektesebet
- 2/232 Wela tehmil `eleyna işren kema:
Bargiran lime neke wek berya me
r. 17.
- 2/233 Rebbena her ti wî: ente mewlana
Dost û hafîz xudyê emrî mena
- 2/234 Men qereen ayeteyni min beqer
Wê şevê besî wî ye got pêgember

3. Suretê Ali'imran

- 3/1 Muşeddîqen lima beyne yedeyhi:
Teşdîq dikî kitabê min qeblihi
- 3/2 Ellezî yuşewwîrukum fi`l-erham:
Şekl û şuretê we çîdkî fi`l-erham
- 3/3 Minhu: hinek ayatun muhkematun:
Beyan dikin helal û hûrumatun
- 3/4 We uxeru: ewî dî muteşabihat:
Neşerîh e çend me`ne muhtemîlat
- 3/5 Zeyxun: meyla ji heqqê wî hidayetê
Rasixun: `alimê şabît muhtedî
- 3/6 Ke`bê eşref mişala qelbê zeyxun
Ibnû selam ji wa hîbrê rasixûn
- 3/7 Kede`bî: wek halê fiet firqetun
Re`ye`l-`eynî: li ber çava xuyad bûn
- 3/8 La tuzîx: tê meyl nekî qulubena
Piştî iman: be`de îz hedeytena
- 3/9 Fieteyni`l-teqeta: di bedrê da
`Ibret e di herba herdu cem`a da
- 3/10 Qenaîri`l-muqentêr: malê pir e
Şed hezar an jî weke kîsê zêra
- 3/11 Musewwemeh: hespê baş binişan e
Welen`amî: pez û dewar deve ne
- 3/12 We`l-herşî: çandini û zira`et e
Husnu`l-meâb merci`ê xweş cennet e
- 3/13 Qultu: bêje ma qey une`b-biukum
Ma ez bêjim ya xêrtir bal rebbukum
r. 18.
- 3/14 We qîna: tu me xilaske ya Ellah
Qanitîne: muti`i li emrillah

- 3/15 Înne`d-dîne ‘indellahi`l-islam:
Dîne heq li cem Xudê her islam
- 3/16 Înnellahe Xudê seri‘ul hisab:
Gelek zû û ‘ecele dibînê hisab
- 3/17 Tu`fîl mulke men teşâu: tu didî
Ê dixwazî mulk û ni‘metê didê
- 3/18 We tenzi‘u`l-mulke mimen teşâu:
Mulkê Wî jî distînê ê teşâu
- 3/19 Tulicu`l-leyl fi`n-nehâr: daxil dikî
Şevê li rojê hem rojê zêde dikî
- 3/20 Leyse: nîne minellahî fî şeyîn:
Ji dostaniya Xudê nîne şeyîn
- 3/21 Îlla en tettequ minhum tuqaten:
Îlla wextî tirs û zorê necaten
- 3/22 Yuhezzezzîrukumullahû nefseh:
We bi ‘ezabê xwe d`tirsînî Ellah
- 3/23 Fettebi‘unî: bibin tabi‘ê min
Yuħbîbkum: da Xuda hij we bikin
- 3/24 Ma fi betnî muħerreren teqebbel:
Hemlê min nezra qudsî ye teqebbel
- 3/25 Pîrek nabî wek zilama: we leyse
Ji bo xizmet ezzekeru ke`l-unşa
- 3/26 Innî: ez u`izuha ħifza wî dikim
Bîke ya Reb bi quwweta te dikim
- 3/27 Enbeteha: şîn fikir xweyî fikir
Nebaten ħesenen: qenc xweyî fikir
- 3/28 Qale ya Meyrem enna lekî haza:
Ma ji ku`j te re tê ev fêkî taze
r. 19.

- 3/29 Rebbî hebli min ledunke zuriyyeten:
Bide min li cem xwe weledêk şalihen
- 3/30 Muşeddîqen bîke li me tin minellah:
Nebî Yehya teşdîq dikî ruhullah
- 3/31 Pêşivanî qewmê xwe ye seyyîden
Hesra nefsê li ser ta'et heşuren
- 3/32 Wemre etî 'aqir: naynî zaroka
Îlla remzen: îlla işaret bike
- 3/33 Wese`b-bih bil'eşîyyî we`l-ibkar:
Zikir bike tê şibêhê û êwarê
- 3/34 Rebbî enna yekunu lî weledun:
Çawa wê çêbî ji min ra weledun
- 3/35 Minetîfîni: ji heriyê ez çêkim
Ke heyeti`t-teyrî şeklê teyr çêkim
- 3/36 We ebirûl ekmehe we`l-ebreşe:
Ez ê sağ kim ewî kor û ebreşe
- 3/37 Felemma ehesse: zanî bi`l-ħewas
Men enşarî ma kî ye dostê min xelas
- 3/38 Qale: gotin neħnu em enşarullah
Arê karê dîn li ser `edûwellah
- 3/39 We mekerû: ħile û pîlan çêkirin
Mekerellah: ħilê wa li wa veşerin
- 3/40 Wallahu her ew e xeyru`l-makirîn
Bi quwwet û qenctir e ji makirîn
- 3/41 Înni muteweffike: rafi`uk
Ez te hildim cem xwe: şumme umîtuk
- 3/42 Şumme: piştire nebtihil: em tevbikin
Di'a û tederru`ê j`bo Xudê bikin
- 3/43 Fenec`el: em bigerînin le`netê

- Ser kazîbê ‘Îsa bejin le‘netê
r. 20.
- 3/44 Te‘alew: werin, ila kelimetin
Kelima tewhîd, sewain: ku ‘edl in
- 3/45 Wela yettexîze bila qet nekin
Be‘duna be‘den erbaben: şerîken
- 3/46 Ha entum haulaîhûn hâcectum:
Hûn ev in, ev eḫmeq in, hem cadeltum.
- 3/47 Hâcectum fima lekum bihi ‘ilmun:
Weşfê Eḫmed di tewrat lekum ‘ilmun
- 3/48 Înne ewle nasi bi Ibrahim e:
Nêzîktir layiqtirî Ibrahim e
- 3/49 Lellezîne`t-tebe‘u hu: wextê wî
Hazan nebîyî Muḫammed ummeta wî
- 3/50 Leyse: nîne ‘eleya fî umiyyin:
Ji xwarina malê cahil umiyyin
- 3/51 Sebîlun: riya guneh ku ji wabî
Lewra ew ne yehudun go ḫeram bî
- 3/52 Ellezîne yeşterûne bi‘ehdîl
Lillahî: firotin soza Xudê bi qelîl
- 3/53 Ulâike: nîne ji bo wa eḫbara:
La xelaqe: qedr û qîymet ji wa ra
- 3/54 Leferîqen yelwune elsinete:
Hinek eḫbar meyl dikin kelimete
- 3/55 Lakin kunu hûn bibin rebbaniyin:
Ey eḫbarno bibin ‘alim ‘amilin
- 3/56 Îz: tu bîne bîra xwe go rebbê te
‘Ehd û mişaqe ennebiyîn sitande
- 3/57 We exeztum ‘ela zalîkum işrî
We li ser wî ‘ehd û soz qebûl kirî

- 3/58 Efeğeyre dîni`l-lahî yebgun
Ma ji geyrê dînê wî yetlibûn
r. 21.
- 3/59 Milul erdî zehoben lewifteda:
Qebûl nabî erdî tijî zîr bide
- 3/60 Len tenalul bîrre: nagêhên xêrê
Hetta tunfîqû hetta bigêhên xêrê
- 3/61 Fettebi`û millete Ibrahime:
Bibin tabi`ê dînê Ibrahim e
- 3/62 Henîfen: mailen ji dînê başil
Li ser dînê heq û şehîh dur başil
- 3/63 Lellezî bi Bekkete mubareken:
Ev beyta li Mekkehê mubareken
- 3/64 Welillahî `elen nasî hiccu`l-beyt:
Heqqê Xudê ser insana çûna beyt
- 3/65 Lime: çima teşûddûn: meni` dîkin
Tebgûneha `iwecen: meyl tehrîfin
- 3/66 We entum tutla `eleykum ayatun
Halê ser we têne xwendin ayatun
- 3/67 We men: bi kesî ye`tesîm xwe pê bigrî
Billahî bi dînê Xudê û şer`ê bigrî
- 3/68 Ittequllahe heqqe tuqatihî:
Bitirsin heqqê tirsî minellahî
- 3/69 We`teşîmû biheblillah cemi`en:
Bigrin tayê dîn û şer`ê cemi`en
- 3/70 `Ela şefa hufretîn mînen narî:
Ser kenarê korta agir ku bîmrî
- 3/71 Weltekun: bila hebî minkum ji we
Ummetun: cema`etun qismek ji we

- 3/72 Kuntum xeyre ummetîn hûn uxricet:
Qencê millet û dîna hûn in derket
- 3/73 Yuwellûkum el edbare: bidne we
Di herbê de birewin pişt bidin we
- 3/74 ‘Eleyhimu`z-zilletu: ew zelîl bûn
Eynema: li ku, şuqifû: ew mewcûdbûn
r. 22.
- 3/75 Îlla biheblin minellah: bi`l-iman
Minen nasî illa bi ‘ehda mu‘minan
- 3/76 Leysû: nabin; sewaen wek hev
Ummu`l-kitab eħbarî weînehu wek hev
- 3/77 Ummetun qaimetun: hinek ji wa
Limêj dikin hinek kafirin ji wa
- 3/78 Kemeşelî riħîn: weke bayê tê
Fiha şirrun: cemidî bayê gur tê
- 3/79 Eşabet herşe qewmîn ew zelemû:
Werî ser zadê qewmî ku zalim bû
- 3/80 La: nekin, tettexîzû biñaneten
Min dûnikum: geyrî we dostî xaşşen
- 3/81 La: nakin teksîr nakin, ye‘lunekum:
Xebalen ey fesaden zîrar dikin
- 3/82 Weddu ma: ew dixwazin wî tişta ku
‘Enimtum: hûn naxwazin ku zîrar bû
- 3/83 Bedeti`l-beğdau: kîna wa derket
Ji dev û efwahihim bêhemd derket
- 3/84 Wema tuxfî şuduruhum ekberu:
Kîna singa wa hî mestir ekberu
- 3/85 Ha entum ey mu‘minin hûn ulaî
Ev in, ew nezan in din welaî
- 3/86 Hûn mu‘mîn ħij wa dikin: yuħibbûne

Hij we nakin ew, wela: yuhibûne

- 3/87 ‘Eddu: gezkin, enamile mine`l-geyz
Muhvikê xwe ji qehra we û ji geyz
- 3/88 Qul: bêje mûtû bi geyzikum: bimirin
Hûn bikin û qehra xwe bibe‘ecin
- 3/89 În: eger, temseskum hesenetun:
Xweşî`l we bî, tesu`hûm: mehzûn dibin
r. 23.
- 3/90 În: eger, tuşibkumu seyyietun
Ne xweşî bî, tefrehû: keyf xweş dibin
- 3/91 În teşbîrû we tettequ: teqwa bin
La yeđurru keydun: ku hîla bikin
- 3/92 Tu bîne bîra xwe sibe: iz gedewet
Min ehlike ji malî zû tê derket
- 3/93 Tubewû`l-mu`minîne: hazir kî
Meqa`ide: cihê herbê çê dikî
- 3/94 Îz hemmet: wextê xwestin taifetan
En tefşela ku vegerin ji tirsan
- 3/95 Bi bedrin we entum hûn ezîlletun
Xudê nişret kir digel ku hindikbun
- 3/96 Elen yekfiyekum: ma qey ne bes in
Melaiketi`b nîşan: musewwîmîn
- 3/97 Ma ce‘elehullahu îlla buşra:
Geleba Bedrê bû mizginiya kubra
- 3/98 Lî yeqte‘e terfen mine`l-lezîn:
Da bikujin qismekî ji kafir în
- 3/99 Yekbitehum: bikin ku ji geyz û kîn
Serê xwe bitewînin herin xasirîn
- 3/100 Leyse leke min emrî nîne şey’

Tê ‘ebdê di destê te de nîne şey’

- 3/101 Wesari‘û: ‘ecele bikin li ta‘et
Da hûn bighên meğfîretê û cennet
- 3/102 Kazîmîne`l-ğeyze: qeħra xwe bixwe
Digrin û diquryînin di nava xwe
- 3/103 We men yegfiru`z-zunûbe illellah:
Ma kî gunha ‘efudkî ji geyrê Ellah
- 3/104 Ni‘me ecru`l-‘amilîn çi xweş ucret
Ê cezayê wî bî cennet meğfîret
- 3/105 Keyfe kane ‘aqîbetu`l-mukezzîb
Meyzî çawa bû taliya ê kazîb
r. 24.
- 3/106 Wela: nebin, tehinû: hûn sist nebin
Wela: nebin, teħzenû: meħzun nebin
- 3/107 We entumu`l-e‘lewne: ğalib hûn nin
Ê bibin menşûrû dewlet her hûn nin
- 3/108 În yemseskum qerħun: ger birîndar in
Feqet messe`l-qewme: ew jî birîn bûn
- 3/109 We tilke`l-eyyamu; rojê reş û ħerb
Nudawiluha: digerînin ê bi te‘b
- 3/110 Tettexize: da Xudê çêkî ji we
Şuhedae: şehîd şahida ji we
- 3/111 Li: ji bona ku Xudê yumeħħîşe
Tahir û ‘efû bikî lî yuxlişe
- 3/112 We yemħeqe`l-kafirîne: wa bibî
Helakê wa miħû bikî bi ħerbê
- 3/113 Temennewnel mewte herbê dixwazin
Min qeblî en telqewhu: berî bikin
- 3/114 Feqed reeytumuhu: va we ħerb kir
We entum tenzurûne: çima nekir

- 3/115 Wema: nîne zêdetir ji insana
Muhemmed illa resul nebiyyuna
- 3/116 Efein mate: ma qey ku ew bimirî
Ew qutîle: bê kuştin şehîd herî
- 3/117 În qelebtum: ma qe hûn ê vegerin
‘Ela e‘qabikum: şûnde vegerin
- 3/118 Wema kane lî nefsîn en temute:
Mirin nîne ji kesî re bê Xuda
- 3/119 Kitaben mueccelen: wextê mewtê
Me‘lûm e nivîsiye nafewutê
- 3/120 We ke eyyîn: gelekî ji nebiya
Ribbiyyûne û ‘alima herb kirya
r. 25.
- 3/121 Ma wehenû: sist nebûn ji cihadê
Ma de‘ufû: bi kuştina ji bo Xudê
- 3/122 Mestekanû: zelîl û teslîm nebûn
Wema kane qewluhum: ev gotibûn
- 3/123 Senulqî: em ê bixin qelbê kafir
Erru‘be: tirsê hetta bibin xasir
- 3/124 Cihê wa we bî’sê meşwa zalimîn
Çi pîs cihû meskene li`z-zalimîn
- 3/125 Îz: tu bîne bîra xwe li Uhudê
Teħussune: wa bê riş tavîn ‘erdê
- 3/126 Hetta îza feşiltum: tenaze‘tum
We`xtilaf kir we belavbûn feşiltum
- 3/127 Min be‘dî ma erakum ma tuħibbûn:
Piştî we dît a we d`xwest ku zefer bûn
- 3/128 Min kum ji we hinek hene ji rûmat
Men yuridu`d-dunya: mal û genîmet

- 3/129 We minkum men yuridu`l-axirete:
Ê şabit bûn niyeta wa axrete
- 3/130 Tuş'idune: bi çiyê ve direvin
La telûne: kes li kesî napirsîn
- 3/131 We resulu yed'ukum: di bak î we
Werin cem min, fî uxrakum: li du we
- 3/132 Xudê hûn cezakirin: eşabekum
Yek ser yekî gemmen bi gem eblakum
- 3/133 Gemma ewwil fewta mal û genîmet
Gema şanî cerh û qetl û hezîmet
- 3/134 Lebereze: wê derkevî ê meqdud
Herî meqtel međaci'î welaw dud
- 3/135 Tewellew: li Uğudê ewî revîn
Yewme`l-teqel cem'anî ji mu'minîn
- 3/136 İnnema isteze`l-lehumu`ş-şeytan
Xwest ku wa bişemfîn ew xapiyan
r. 26.
- 3/137 Febima reħmetîn: go ew minellah
Bi reħm û feđla ku dabû te Ellah
- 3/138 Linte lehûm: tu ji wa re nerm bûyî
Fezzen: ewî ziman ne xweş hiş bûyî
- 3/139 Len feddû min ħewlike: ewî herin
Bela bin ji dura te navegerin
- 3/140 İn yenşurkum fela ħalibe lekum:
Kes nikare ku Xudê naşirukum
- 3/141 İn yexzulkum: ku meġlûb zelîl bikî
Men zellezî; ma kî heye arîbkî
- 3/142 Ma kane li nebiyyin en yexulle
Xiyaneta ji nebî ev muħal e
- 3/143 Efemen ittebe'e riđwanellah

Ma qey ê bibî tabî' rîza Ellah

- 3/144 Kemen bāe bi sexetîn minellah
Weke ê vejerî bi xezeb`ellah
- 3/145 Leqed men: Xudê minnet kiriye
Îz be`ese: ku resulek şandiye
- 3/146 We îñ kanu mîn qeblû lefî delal:
Welew berî ew hebûn di nav delal
- 3/147 Ewelemma eşabekum muşîbet:
Wextê uşud hate ser we muşîbet
- 3/148 Qed eşebtum mişleyha: di bedrê da
We mu`mîna di ca bihtir te`de da
- 3/149 Qultum yanî ewe qultum çima got
Enna haza: ev hezîmet çawa hat
- 3/150 Hum lil kufrî yewme îzin eqrebu
Munafiq bêhtir nêzîkê kufrê bû
- 3/151 Lew: eger eşa`una ma qutilû
Wek me kirba ned`hat kuştin qutilû
r. 27.
- 3/152 Fedreû: vejerînin hûn nehêlin
`En enfusîkumu`l-mewt: ku hûn bimrin
- 3/153 Ferihîne: ew şehîd keyfxweş dibin
Yestebşîrone: ew mizgînî didin
- 3/154 Billezîne lem yelheqû: ê werin
Min xelfihim: piştî ware şehîd bin
- 3/155 Ella xewfin: nîne tirs ji bona wan
Wela hûm yeşzenune: şuzna ewan
- 3/156 Ennellahe la yudî`u: ku Xudê
Winda nakî ecr û xêra ji bo Xudê
- 3/157 Ellezîne`s-tecabû; icabet kir
Lillahî we`r-resulî ita`etkir

- 3/158 Mîn be‘dî ma eşabehumu`l-qerhu:
Li Uhud pêş tê tamam ku bûn cerhu
- 3/159 Qed ceme’û lekum fexşewhûm ji wa
Hûn bitirsin wa hatin we koma wa
- 3/160 Hësbunellah: Xudê tenî besê me
We nî‘me: xweş wekîl e ji bona me
- 3/161 Înnema numli lehum li yezdadû:
Bi muhletî gunehê wa yezdadû
- 3/162 Makanellah li yezere`l-mu‘minîn:
Xudê wekhev nahêlî wa mu‘minîn
- 3/163 Hëta yemizel xebîse: munafiq
Mîne`ţ-teyyib ji mu‘mina bibî ferq
- 3/164 Makanellah li yutli‘e ‘elel ğeyb:
Xudê we mutellî‘ nakî li ser ğeyb
- 3/165 Welakîn yectebî min rusulihî:
Lêbelê dineqînî resulihî
- 3/166 Zen nekin ellezîne yebxelûne
Ewê ku`j bo zekatê bexîl bûn
- 3/167 Seyute`w-wequne: wî bîn toq kirin
Mabexilu: ku men‘a zekat kirin
r. 28.
- 3/168 We neqûlu zûqû ‘ezabe`l-herîq:
Te‘m kin ‘ezab pir bi şewat ê herîq
- 3/169 Kullu nefsin: çiqa tiştê bi riş bî
Çi melek çi ins û cin çi heywan bî
- 3/170 Zaiqetu`l-mewtî: mirinê te‘m biki
Sekerat û şerbeta mirinê vexuyî
- 3/171 Înnema: bi tehqîq hûn, tuwefewne:
Bê kêmayî xêra xwe wî bibîne

- 3/172 Femen: kesî zuhzihe: xilas bibî
Ji êgir, feqed faze: xilas dibî
- 3/173 Nebedûhu werâe zuhurihim
Soz avêtin pişt xwe wa eḥbarihim
- 3/174 Guhnedanê ji bîr kirin ‘emel nekirin
Bi tişteki hindik wa soz firotin
- 3/175 Men tudxili`n-nare: ê tekir agir
Exzetehu: te ew pîs û rezîl kir
- 3/176 Rebbena teweffena: me bîr bîne
Me‘el ebrar: ku ehlî qencyê ne
- 3/177 Inneke la tuxlifu`l-mi‘ad: nakî
Tê ji soz û ‘ehda xwe vejer nakî
- 3/178 Inni ezla uđî‘û: winda nakim
‘Emel karî ‘amilin şaliḥ minkum
- 3/179 Wellahu ‘indehu her ḥusnu`ş-şewab
Cem Xudê ye çêtirê xêr û şewab
- 3/180 La yexu`r-renneke: te nexapînî
Teqellub: çûn û hatin ji bo dinî
- 3/181 Teqelluba wa kafira fil bîlad
Ji bo îş û ticaret keyf û xebat
r. 29.
- 3/182 Işbirû: şebrê bikin li ser belan
Şabirû: reqebeta li ser bela
- 3/183 We rabiṭu hespa bigrin li ḥudud
Hûn nobetê bigrin li hember yehud
- 3/184 Reqabeta şebrî hûn di nav hev da
Reqebeta şebrê li ser yehuda ey kafir
- 3/185 Şehru`l-ḥeram çar in receba eşem
Zilqe‘de we zi`l-ḥicce we muḥerrem
- 3/186 Di meh û deh roj in ew eş-huru`l-ḥec

Şewwal û zilqe‘de û dehê zî`l-hec
r. 30.

4. Suretê Nîsa

4/1 Wettequllahe`l-lezî tesâelûne
Bitirsin jê wî Xudayê ku dixwazin

4/2 Bi heqê wî ji heq tişta dixwazin
We`l-erhame beheqê qerabet kin

4/3 Xudê zanî yazdikî ew reqîben
Malê yetîm huben zenben kebîren

4/4 Zalıke ev edna te‘ûlû
Nêzîktir e ku ji heq la temîlû

4/5 Mehra pîreka bidin hûn nişleten
Bi ‘eşq û ji keyfa dil ferideten

4/6 Fein tîbne bi keyfa henîen
Ew helal hem ‘efyetrî merîen

4/7 Ce‘ele Xudê kir le kum qiyamen
Tedbîra malê sefîh ji wer daimen

4/8 Webtelu`l-yetama we tecrube bikin
Fein anestum we digo reşîd bin

4/9 Isranen we bidaren lezî nekin
Li xwarina malê yetîm xilas kin

4/10 Berê ku ew mezin bî an yek berû
Û meni‘ kin min qeblî en yekreû

4/11 Yuşikumullahu fî ewladîkum
Emr û beyan diknî fî ewladîkum

4/12 Lizzekerî mişlû hezî`l-unşeyeyn
Ji lawarabi qasiheqî di binteyn

4/13 Min be‘dî weşiyetin yuşi biha
Leva kirin piştî deyn û weşiyeta

- 4/14 Warişê`j geynê bav û kur kelaleten
Xah û birayê`j dê kelaleten
- 4/15 Weqed efda be`çukum ila be`çin
Hûn keşîbûn berî hev ila be`çin
- 4/16 We rebbaikum keçê selbiyê we
Hêlailû ebnaikum bûkê we
- 4/17 Muşşinîne ewê ku zewicîne
Ĝeyrî mesafîhine ne zanîne
- 4/18 Wela ne muttexasatî exdanin
Ew bidizî yara`j xwe re negirin
r. 31.
- 4/19 Xeşiyel `enete ji tirsazinê
Tewlen ew malî bidî mehrazinê
- 4/20 In eger tectenibû kebaire
Hûn xwe dûr kin ji gunehê kebîr e
- 4/21 Nukeffîr `efwe kun seyyiatikum
Gunehê we yê biçûk dê `efû kim
- 4/22 Erricalu qewwamûne mesûl in
Qaim bi tedbîra mal mecbûr in
- 4/23 `Ele`n-nisai li ser pîreka xwe
Amîr û mudebbir in li mala xwe
- 4/24 Bima bi wî tiştaz ku feddelellah
Feddelû ni`met kir li zilama Ellah
- 4/25 We bima enfequ min enwalihim
Bi sebab infaq û meşref tev minhum
- 4/26 Wellatî texafûne nuşûzehun
Ew pîrekê hûn ditirsin bigeydin
- 4/27 `Izûhun wencurû hûn fî`l-medaci`
Neşihet û terka lihêfê we meddeci`
- 4/28 Fela tebgû `eleyhinne hûn nekin
Di `eleyhê wî de `eksê hûn nekin

- 4/29 We in xiftum şeqaqe beynihima
Ku we zanî nexweş bû nabeyna wa
- 4/30 Wel carî ciranî zi`l-qûrba nîzîk
